المركز السوري للإعلام وحرية التعبير
Navenda Sûrîyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê
Syrian Center for Media and Freedom of Expression

# Vegera bi Neçarî ya Penaberên Sûrî yên li Turkiye û Lubnanê




image: Internet

# Vegera bi Neçarî ya Penaberên Sûrî yên li Turkiye û Lubnanê

**Navenda Sûrîyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê** navendeke serbixwe ne-hikûmî û ne-qezenc di 2004-an de li Fransa hatî tomar kirin,Li ser mafên mirovan û pêşveçûna medyayê disekine.Navend ji aliyê desteya rêveber a bê heqdest tê birêvebirin her weha navend xwedî posteke şêwirmendî ya taybet e di Encumena Aborî û Civakî ya Neteweyên Yekbûyî de ji sala 2011an ve.

Navenda Sûrîyeyî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê hewl dide civakek ku azadîya derbirînê û bawerîyê, mafên mirovan û dadmendîyê garantî bike, ava bike. Ji damezrandina wê di 2004 de, Navendê hewildanên xwe ji bo parastina parêzvanên mafên mirovan, berevaniya mafên mirovan û azadiyên bingehîn, bihêzkirina civaka sivîl û komeleyên qurbaniyan, û pêşxistina sektora medyayî ya serbixwe û profesyonel kiriye.

**Mafên belavkirinê © 2023 Navenda Sûrî ya Ragihandin û Azadiya Derbirînê (SCM)**

www.scm.bz/en

Ev raport sala 2024an ji aliyê Dr. `Umer Hemade ve hatiye amadekirin

المركز السوري للإعلام وحرية التعبير
Navenda Sûrîyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê
Syrian Center for Media and Freedom of Expression

# nanêlzêr û îsapS

Serpereştiya giştî: **Mazin Derwîş**

Amadekirina Lêkolînê: **Dr. `Umer Hemade**

Lêvegerandina Lêkolînê: Rêvebirê Nivîsgeha Yasayî ya Navendê **Dr. Eymen Mun`im**

Ev raport bê beşdarî û piştevaniya sereke ya Şahidhal û Rizgarbûyî û malbatên Qurbaniyan ên ku bi me re beşdarî hevpeyvîn û bersivdana Rapirsînan, bûn, nedihat encamdan

Spasî ji bo herkesê dinava Navenda Sûrî ya Ragihandin û Azadiya Derbirînê de û kesên pê re alîkar e ku di hemî qunaxên nivîsandina Raportê, ji qunaxa amadekirinê û ta bicîkirin û derxistina wê, alîkar bûn.

Em spasiyeke taybet ji bo Tîma Vegera bi Neçarî ya Navendê dikin ku binpêkirina Vegera bi Neçarî û windakirina di dema penaberiyê de, dişopînin û belge dikin, herwiha ji bo bihêzkirina raportan bi behane û belgeyan peywendiyê bi Qurbanî û Rizgarbûyî û Malbatên wan re, dikin.

# Content


**I- Kurteyeke cîbicîkarî** .......... 2

**II- Pêşgotin** .......... 2

**III- Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî** .......... 4

1. Jêdera Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî .......... 4
2. Sûdmendên Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî .......... 5
3. Ne-Vegera bi Neçarî û Yasaya Navdewletî ya Nerîtî .......... 6
4. Naverok û çarçoveya Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî ya penaberan .......... 7
5. Vegera bi Neçarî ya bi nav Xwebexş .......... 7

**IV- . Çarçoveyên yasayî û praktîka ku li Lubnan û Turkiyê li hemberî penaberên Sûrî, tên bicîkirin** .......... 9

1. Lubnan .......... 9
   - I- Çarçoveya yasayî .......... 9
   - II- Pratîkên li hember penaberan .......... 11
2. Turkiye .......... 15
   - I- Çarçoveya yasayî ya parastina penaberên Sûriyê: .......... 15
   - II- Praktîkên li hemberî penaberan: .......... 17

**V- Vegera ewleh bo Sûriyê** .......... 21

**XXI- Raspaste** .......... 23

1. Ji bo welatên mêvandariya penaberan dikin: .......... 23
2. Ji bo welatên Bexşer: .......... 23
3. Ji bo Komisyariya Penaberan: .......... 23
4. Ji bo Civaka Sivîl a Sûriyê: .......... 24

**VI- Dawî** .......... 25

# I- Kurteyeke cîbicîkarî

Ev raport behsa pirsa parastina penaberên Sûrî yên li Lubnan û Turkiyê li dijî Vegera bi Neçarî, ji aliyê yasayî û praktîkî ve, dike, herwiha behsa asta guncawbûna çarçoveyên yasayî û reftarên praktîkî yên li van herdu welatan têne bicîkirin, li gorî pabendiyên wan ên navdewletî dike. ji bo vê armancê, ev raport li gorî Peymanên Navdewletî û Dadgehên Berawirdkirinê, Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî ya penaber û penaxwazan, û cihê wê Prensîpê di Rêkeftina Penaberan û di Yasaya Navdewletî ya Nerîtî de, û danasîna sûdmendên ji vê Prensîpê, û çarçoveya dûdmendiyê, şirove dike. Herwiha behsa cihê Vegera Bi nav Xwebexş di çarçoveya danasîna "Vegera bi Neçarî" de, dike.

Tevî rewşa taybet a Lubnan û Turkiyê li hemberî Rêkeftina Penaberan, raport mijara pabendî bi Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî ya penaberan ji bo herdu welatan, netenê li gorî Yasaya Nerîtî, lêbelê li gorî panendiyên wan ên girêbestî di çarçoveya hin sozname û rêkeftinên din de jî, şirove dike. Raport herwiha kêmasiyên çarçoveyên yasayî yên ku ji aliyê Turkiye û Lubnanê ve ji bo çarçovekirina pirsa penaberan hatine daraştin, destnîşan dike, ta ku reftarên wan ên praktîkî li hemberî penaberan, bişopîne. Di vê çarçoveyê de, raport çawaniya binpêkirina van çarçoveyên yasayî û reftarên praktîkî ji pabendiyên navdewletî yên hedu welatan, herwiha sîstema wan a yasayî ya navxweyî jî, nîşan dide. Raport herwiha merc û pîvanên Vegera Ewle ya penaberên Sûrî li gorî Komisyariya Bilind a Penaberan, nîşan dide, û bi hin sparteyan bi dawî dibe.

# II- Pêşgotin

Di demê ku Komisyariya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekgirtî tekez dike ku Sûriye welatekî ne aram e ji bo vegera penaberan[1], û derketina gelek raportan li ser têkçûna rewşên ewlehî û aborî li hundirê wî welatî, ji aliyekî ve[2], û li ser reftara xirab a Sûriyên ku bi neçarî vedigerin welatê xwe, dibînin, ji aliyekî din ve[3], gelek raportan li ser pêlên Vegera bi Neçarî ya penaberên Sûrî ji Lubnan û Turkiyê.[4] derdikevin Ew herdu welat mêhvandariya mezintirîn kombûna penaberên Sûrî li Rojhilata Navîn dikin, ku 3.6 milyon Sûrî li Turliyê[5], û 1.5 milyon li Lubnanê dimînin[6].

1 Komisyariya Bilind a Karûbarên Penaberan UNHCR, Parastina Navdewletî, Berçavbirinên girêdayî kesên ku ji Komara Erebî ya Sûriyê direvin, Nûkirina Şeşan, Adara 2021ê.

2 Banka Navdewletî, Aboriya Sûriyê piştî şerekî ku deh salan dirêj kir, di rewşeke xirab de ye, 17ê Adara 2023yan.

3 Rêxistina Lêborînê ya Navdewletî: Sûriye "Berê te li mirina te ye" Binpêkirinên li dijî Penaberên Sûrî yên ku vedigerin Sûriyê, 7ê Îlona 2021ê; Hiyûmen Rayits Wotş, Jiyaneke weke mirinê "Vegera penaberên Sûrî ji Lubnan û Urdunê", Cotmeha 2021ê.

4 Hiyûmen Rayits Wotş, Turkiye: Dîportkirina bi sedan penaber bo Sûriyê, 24ê Cotmeha 2022yan; Pasewanên Sînorî yên Turkiyê hejmarek Sûriyan işkence dike û wan dikuje, divê Turkiyê dawî li ji bêsizadanê bîne, 27ê Nîsana 2023yan; Lubnan: Hêzên Çekdar bi tedabîrine kurt hejmarek Sûriyan dîport dikin. Divê aliyên Bexşer piştrast bikin ku pereyên wan nabin alîkar ji bo encamdana binpêkirinên mafan; Kurdistan24, Turkiye 29,895 penaber û penaxwazên Sûrî dîport dike: Raporta Sûriyên ji bo Rstî û Dadweriyê, 22ê Îlona 2023yan. 5ê Tîrmeha 2023yan; Rêxistina Lêborînê ya Navdewletî, Lubnan: Vegera bi Neçarî ya bihtirî 100 penaberî bo Sûriyê paşketineke metirsîdar e.

5 Nameyek ji Komisyariya Bilind a Karûbarên Penaberan bo Perleman û Encumena Ewropî: Raporta Heftan a Salane ya Saziya Penaberan li Turkiyê, 22ê Îlona 2023yan.

6 Komisyariya Bilind a Karûbarên Penaberan, Komisyariya Bilind a Karûbarên Penaberan li Lubnanê, danasîneke kurt.

Di rastiyê de, her du welat derbarê Peymana sala 1951ê ya taybet bi penaberan, xwedî rewşeke hestiyar in (Li vir, Rêkeftina Penaberan, an Rêkeftina 1951ê). Di demê ku Lubnanê li ser wê rêkeftinê imze nekir[7], Turkiyê imze kir, lê tenê ji bo ciyografiyekê destnîşan kir, ango mafê parastinê tenê ji bo hemwelatiyên welatên Ewropî yên li ser xaka Turkiyê dimînin, destnîşan kir[8]. Serbarê wê yekê, herdu welatan rêbazeke demkurt û li gorî xwe, li hemberî kirîza penaberên Sûrî, şopand[9], piştre ew rêbaz kirin di çarçoveya nivîsine ku ne li gorî pabendiyên wan ên navdewletî di vê babetê de ne. Lê ji aliyê yasayî ve, divê herdu welat bi Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî ya penaberan pabend bin. ji bo Turkiyê, ev yek li gorî Rêkeftina sala 1951ê ye, û ji bo Lubnanê ew yek li gorî aliyê Nerîtî yê heman Prensîpê li gorî Yasaya Navdewletî ya Giştî ye[10], serbarê «Pejirandina Xwebexş» ji aliyê vî welatî ve ji bo bicîkirina pêwîstiyên Rêkeftinê[11], û hebûna Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî ku bingeha rêkeftinine din ên navdewletî ye ku Lubnan pê pabend e.

Ev raport parastina penaberên Sûrî li Lubnan û Turkiyê li dijî Vegera bi Neçarî, ji aliyê yasayî û praktîkî ve, û radeya guncawbûna çarçoveyên yasayî yên pesendkirî û reftarên praktîkî yên li van herdu welatan bi pabendiyên wan ên navdewletî re, dinirxîne. Ji bo vê mebestê, raport dê, Yekem, Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî di Yasaya Navdewletî ya Yenaberan û pabendiyên van herdu welatan (I), piştre çarçoveyên yasayî yên pesendkirî li van herdu welatan, û reftara wan ya praktîkî li hemberî penaberên Sûrî û radeya guncawbûna wê reftarê bi pabendiyên wan yên navdewletî re (II) binirxîne. Di dawiyê de, raport behsa mercên Vegera Xwebexş û Ewleh ya penaberên Sûrî (III), dike, piştre bi hin rasparteyên praktîkî ji bo hemî aliyên karîger ên peywendîdar bi vê dosyayê, bi dawî dibe (IV).

7 Raporta dem bi demî ya Komara Lubnanî li bêş Komîteya Mafên Mirovan 18ê Çileya 2021ê.r.23, m 192.

8 Hiyûmen Rayits Wotş, Turkiye, Parastina Penaberan

9 B. Berti, "Siyaseta Lubnanê ya kurtbîn ya Penaberan", Saziya Carnegie ya Navdewletî, 31ê Çileya 2017an; Mirovahiya Nû, Gelo rêbaza Turkiyê li hemberî penaberên Sûriyê domdar e?, 15ê Nîsana 2013an.

10 Guy S. Goodwin-Gill, Jane McAdam, Emma Dunlop, "Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî-Beşê Yekem", li. Guy S. Goodwin-Gill, Jane McAdam (nivîser), Penaber di Yasaya Navdewletî de (Çapa çaran).

11 M. Janmyr, "Welatek ji penaberiyê tuneye: Rewayetîkirina redkirina Lubnanê ya Rêkeftina Penaberan a sala 1951ê", Kovara Yasaya Penaberan a Navdewletî, 2017, Beşê 29, hejmara 3, r.438

# III- Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî

Yasaya Navdewletî li ser du Prensîpan hatiye avakirin, ne-Vegera bi Neçarî, û maf di rewşine baş ên jiyanê di welatê penaberiyê de[12]. Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî kevirê bingehîn ê Yasaya Navdewletî ya Penaberan e. wateya wê, ne-vgerandina penaberan ji bo welatê ku jê hatine, yan dîportkirina wan bo welatekî din ku dibe li wî welatî rastî tundiyê bên. Ji bo gerentiya mafên bingehîn ên penaberan, û peydakirina rewşine baş ên jiyanê ji bo wan, Rêkeftina sala 1951ê welatan bi «Peydakirina rewşine pejirandî yên niştecîbûbê «ji bo penaberan, pabend dike. Ev «Rewş» di bingehîn de mafê xwendin û kar û gehiştin bo xizmentguzariyên hawarhatin û alîkariya bingehîn û mafê bûn bi xwedî mulk û bidestxistina belgeyên sivîl, li xwe digre.

Ji bo armancên vê raportê, tekezî dê li ser maf di ne-Vegera bi Neçarî de, were kirin, sebaret mafê »Rewşên niştecîbûneke pejirandî«, em ê tenê peywendiya wî mafî bi Vegera bi Neçarî re, binirxînin. Ango, di çarçoveya ku ji bo me li vir giring e, tê xuyakirin ku »Rewşên niştecîbûnê« yên penaberên Sûrî li van herdu welatan, alavek e ji bo ferizkirina Vegera bi Neçarî yan Vegera bi nav Xwebexş, bi rêya hiştina penaberan di rewşine ku ji bilî vegerê bo welatê xwe yê ku jê revîne, ti bijardeyeke din nemîne.

Di vî beşî de, em ê behsa jêderên Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî ya penaber û penaxwazan (1), û cihê wê Prensîpê di Rêkeftina Penaberan û di Yasaya Nerîtî ya Yavdewletî de (2), hewiha kesên jê sûdmend (3), ast an sînorê ciyografîk yê bicîkirina wê (4), û pirsa Vegera bi nav Xwebexş, wate, rewşa ku penaber ji ber tundiya reftara ku li welatê ku lê bûye mêvandar, xwe dibîne ku ew li pêş yek bijardeyê ye, ew jî veger bo welatê ku ew jê reviyaye, bikin (5).

## 1. Jêdera Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî

Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî kevirê bingehîn ê Yasaya Navdewletî ya Penaberan e. Di madeya 33an a Rêkeftina Penaberan di movika yekem de, wiha hatiye »Nabe ti welatekî ku li ser girêbestê imze kiriye, penaberekî der bike yan wî bi her şêweyekî vegerîne sînorê herêmên ku tê de jiyana wî yan azadiya wî ji ber isniya wî, yan ji ber ola wî, yan ji ber regeznameya wî, yan ji ber alîgiriya wî ji bo çîneke civakî, yan ji ber nerînên wî yên siyasî, rastî gefê were«. Rêkefin nepabendiya welatên ku li ser imze kirine bi vê madeyê, qedexe dike (Madeya 42). Ji nepejrandina derkirinê »bi çi şêweyî be« tê xuyakirin ku Vegera bi Neçarî ya bi nav Xwebexş weke Prensîpeke nerasetrast a Prensîpa resen, nayê pejirandin.

**«Nabe ti welatekî ku li ser girêbestê imze kiriye, penaberekî der bike yan wî bi her şêweyekî vegerîne sînorê herêmên ku tê de jiyana wî yan azadiya wî ji ber isniya wî, yan ji ber ola wî, yan ji ber regeznameya wî, yan ji ber alîgiriya wî ji bo çîneke civakî, yan ji ber nerînên wî yên siyasî, rastî gefê were».**

Ji dema imzekirina Rêkeftina sala 1951ê, ev Prensîp derbasî gelek peymanên herêmî yên girêdayî penaberan bû, ev yek di Peymana Yekîtiya Efrîqî, û Peymana Amrîkî ya Mafên Mirovan, û Ragihannameya Kartageynayê, herwiha di gelek peymanên girêdayî mafên mirovan weke Rêkeftina Rûbirûbûna Işkenceyê (M. 3), û Rêkeftina Parastina hemî kesan ji Windakirina bi Neçarî (M.16), hat encamdan.

12 Kälin, W., Caroni, M., & Heim, L., 'Madeya 33yan, Movik 1', di çapa Zimmermann A., Rêkeftina sala 1951ê ya girêdayî rewşa penaberan û protokola wê ya sala 1967an: Têbîtî (2011) 1335.

Fiqha Dadweriyê dibîne ku erkê ne-Vegera bi Neçarî di naveroka peymanine din de jî heye. Komîteya Neteweyên Yekgirtî ya Mafên Mirovan dibêje ku ev erk di naveroka qedexekirina işkenceyê û reftarên sivkatiyê de heye[13], Ddgeha Ewropî ya Mafên Mirovan jî wiha got, û gelek mafên din ên berçav ên bingeha Peymana Ewropî, zêde kirin[14]. Ddgeha Ewropî ya Mafên Mirovan dibîne ku dibe ku rêznegirtin li rênimayên yasayî yên sereke yên ku divê werin bicîkirin, bibe sedema binpêkirina Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî ya penaberan[15]. Komîteya Mafên Zarokan wiha dibîne ku Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî di çarçoveya Rêkeftinê dema hebûna «Metirsiyeke rasteqîne ya ziyaneke ku ji bo ser zarokî, nayê qerebokirin[16]» tê bicîkirin, dinav de jî metirsiya li ser mana wî zarokî yan metirsya li ser geşeya wî (Madeyên 6 û 37 ên Rêkeftinê). Komîteya Nehiştina Hemî Şêweyên Nijadperestiyê, dibîne ku Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî di naveroka movika (b) ya Madeya pêncan a Rêkeftinê de heye[17]. Komîteya Nehiştina Cudakariya li dijî Jinê jî ew bîroke şopand, ango dibîne ku nabe jin bi Neçarî ji bo welatekî din were Vegerandin heger «Ew yek metirsiyê li ser jiyana wê, yan li ser silametiya wê ya laşî, yan li ser ewlehiya wê ya kesayetî peyda bike, yan egera ku rastî şêwene dijwar ji cudakariyê were, dinav de jî stem an tundutûjî li ser bingeha zayendê».[18]

Berfirehkirina parastinê li dijî ne-Vegera bi Neçarî li gorî rêkeftin û peymanan, herwiha li gorî şiroveyên wê yên yasayî, sînorê erkê li ser mile welatan, herwiha çarçoveya kesên jê sûdmend, berfirehtir dike.

## 2. Sûdmendên Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî

Berferkirina çarçoveya Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî ber bi çarçovene nû ve çû, ango parastin li dijî ne-Vegera bi Neçarî weke ku di protokola sala 1967an de hat guhertin, ji bo kesên ku danasîna penaberan li gorî madeya 1-a(2) ya Rêkeftinê, wan li xwe nagire, gerentî dike, ne jî ji bo kesên ku danasîna berfirehtir ya ku ji aliyê Ragihannameya Kartageynayê ve hatiye pesendkirin, wan li xwe nagire. Weke mînak, li Amerîkaya Latînî, Dadgeha Amrîkî ya Mafên Mirovan ragihand ku çarçoveya Madeya 22 (8) ya Peymanê, çarçoveya parastin li dijî Vegera bi Neçarî, berfirehtir dike ku hemî biyaniyên ku rastî metirsiyê li ser jiyana xwe, yan li ser silametiya xwe, yan li ser azadiya xwe, tên, li xwe digre. Û ji bo gehiştin bo vê encamê, Dagehê qedexekirina işkenceyê bi parastina ji Vegera bi Neçarî ve girêda[19].

---

13 Komîteya Neteweyên Yekgirtî ya Mafên Mirovan, 'Kommenta Giştî ya jimare 31: Awayê Pabendiya Yasayî yê Giştî ya li ser Welatên Peymandar ên Rêkeftinê tê ferizkirin' di 'Kommenta Emîndariyê û Têbînî û Sparteyên Giştî yên ku ji aliyê Desteyên Peymana Mafên Mirovan ve hatine pesendkirin' de, belgeya Neteweyên Yekgirtî HRI/GEN/1/Rev.9 (Beşê yekem (27ê Gulana 2008an) 245-6 Movik 12.

14 Soering li dijî Şahnişîna Yekbûyî (1989) 11 EHRR 439, Movik 88; JK li dijî Siwêdê (2017) 64 EHRR 15, Movik 79. Ji bo gengeşeyê, li Erna Kristín Blöndal û Oddný Mjöll Arnardóttir 'ne-Vegera bi Neçarî li Strasborgê: Têgehiştina rewşên kesane' (2018) 5 Lêvegera Yasaya Oslo 147, vegere.

15 Maf û Gerentiyên Zaokan di Çarçoveya Koçberiyê de, û/yan di Pwistiya Parastina Navdewletî de, Nerîna Rawêjkarî OC-21/14, Zincîra Dadgeha Amrîkî ya Mafên Mirovan A No 21 (19ê Tebaxa 2014an) Movik 230.

16 Komîteya Neteweyên Yekgirtî ya Mafên Zarokan, 'Kommenta Giştî 6: Danûstandin bi Zarokên bê Yawer û yên ji hev Cuda derveyî welatê wan yê resen' di 'Kommenta Sekretariyê, hejmarek Têbînî û Spasteên Giştî yên ku ji aliyê Desteyên Peymana Mafên Mirovan ve, hatine pesendkirin ' de, belgeya Neteweyên Yekgirtî HRI/GEN/1/Rev.9 (Beşê duyem) (27ê Gulana 2008an) 449, Movik 27.

17 Komîteya Neteweyên Yekgirtî ya Jinavbirina Nijadperestiyê, 'Berçavbirina Raportên ku ji aliyê Welatên Peymandar ve li gorî Madeya 9an ya Rêkeftinê hatine pêşkêşkirin: Têbîniyên Dawî yên Komîteya Jinavbirina Nijadperestiyê-Tûnis', belgeya Neteweyên Yekgirtî CERD/C/TUN/ CO/19 (23ê Adara 2009an) Movik 15.

18 Komîteya Neteweyên Yekgirtî ya Jinavbirina Nijadperestiya li dijî Jinê, 'Sparteyên Giştî jimare 32 ' , belgeya Neteweyên Yekgirtî CEDAW/C/GC/32 (14ê Mijdara 2014an) Movik 23.

19 Malbata Pacheco Tineo li dijî Bolîviyayê, Zincîra Dadgeha Amrîkî ya Mafên Mirovan C No 272 (25ê Mijdara 2013an) Movik 135.

## 3. Ne-Vegera bi Neçarî û Yasaya Navdewletî ya Nerîtî

Fiqha Yasayî tekez dike ku erkê ne-Vegera bi neçarç ya penaberan, beşek ji Yasaya Navdewletî ya Nerîtî ye. Weke mînak, di Ragihannameya Niyoyorkê ya taybet bi penaber û koçberan, ku ji aliyê hemî endamên Neteweyên Yekgirtî ve hatiye imzekirin -dinav de jî her çil endamên ku Rêkeftina Penaberan pesend nekirine- hatiye ku ev welat tekeziyê li ser »Rêzê li saziya penaberiyê û mafê bidestxistina penaberiyê, digrin. Herwiha (tekeziyê) dîsan li ser rêzgirtina xwe ji bo Prensîpa bingehîn ya ne-Vegera bi Neçarî, li gorî Yasaya Navdewletî ya Penaberan, û pabendiya xwe pê, dikin» [20].

Fiqha Navdewletî, nerîtiya vê Prensîpê piştrast kir, bi taybetî di hukmên herdu Dadgehên Amrîkî û Ewropî yên mafên mirovan de. Dibe ku takepirsa derdikeve holê di vê babetê de, girêdayî asta hebûna vê Prensîpê di çarçoveya Yasaya Navdewletî ya Nerîtî de, ye. Komîteya Cîbicîkar ya Komisyariya Penaberan, di derencama xwe ya giştî ya derbarê parastinê de, sala 1982an, gotibû ku ev Prensîp hin bi hin dest bi «bidestxistina şêweyê Bingeha Pabendker (yan ya Yekalîker), di Yasaya Navdewletî de, dike [21]- jus cogens YAN peremptory norm».

Tevî ku komdengiyek heye dibêje ku Vegera bi Neçarî bo cihekî ku dibe mirov lê rastî işkenceyê were, bêguman yek ji Bingehên Pabendker ên Yasaya Navdewletî ye, ji ber ku qedexekirina işkenceyê yek ji çînên Bingehên Pabendker e, lêbelê hîn jî gengeşe li ser wê yekê heye gelo qedexekirina Vegera bi Neçarî bi giştî digihe asta Bingehên Pabendker, yan na?.

Dibe ku dawîtirîn pêşketina peywendîdar, bihêzkirina statuya Pabendker (jus cogens) a Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî, nîşan dide. Di Berfanbara 2021ê de, Dadgeha Redkirinê ya Italî got ku Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî netenê bingeheke Nerîtî ya cihgirtî di Yasaya Navdewletî de ye, lêbelê di asta Bingehên Pabendker de ye ku bi ti şêweyî û di çi rewşê de be jî, nabe werin binpêkirin yan istisnakirin, got jî divê rêkeftinine du-alî navbera welatê ku Vegerandina bi Neçarî bicî tîne û welatê ku penaber ji bo wî tên vedigerandin de, hebin, weke Yadaşnameya Jihevtêgehiştinê ya Îtalî-Lîbî ku sala 2017an hatiye imzekirin.

Dibe ku ev xal cihê gelek giring di vê raportê de nebîne. Di vê raportê de, Em giringiyê didin xuyakirina statuya Pabendker a ne-Vegera bi Neçarî weke beşek ji Yasaya Navdewletî ya Nerîtî, wate, ji bo welatên ku hîn li ser Rêkeftina Penaberan pesend nekirine, bingeheke pabendker e weke Lubnanê, weke mînak.

20 Movika 67 ya Ragihannameya Niyoyorkê ya ji bo Penaber û Koçberan ya ku li gorî biryara 71/1 ya Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekgirtî roja 19ê Îlona 2016an, hatiye pesendkirin.

21 Raporta Civîna Sî û Sêyan: Belgeya Neteweyên Yekgirtî. A/AC.96/614, Movik 70.

## 4. Naverok û çarçoveya Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî ya penaberan

Madeya 33an ya Rêkeftina Penaberan ya navhatî, du têgehan li xwe digre, »derkirin« û »Vegerandina bi Neçarî» :«Nabe ti welatekî li ser girêbestê imze kiriye, penaberekî der bike yan vegerîne...«. Madeya 32an jî behsa têgeha derkirinê dike, ku derkirina penaberên ku statuya rewatiyê li ser xaka niştîmanî, wergirtine, qedexe kiriye »Ji bilî sedemên girêdayî ewlekariya niştîmanî yan sîstema giştî«. Û ev binema tenê »li gorî bicîkirina biryarekê li gorî rênimayên sizayî, ku li gorî yasayê, hatiye standin« tê bicîkirin«. (M.32). Diyar e ku derkirina kesên hebûna wan, li gorî Madeya 33 yan 32an, yasayî ye, bi mercê rêzgirtina rêsayên tedabîrî ve girêdayî ye. Lê ji karên amadekarî yên Rêkeftinê tê xuyakirin ku darîştvanên wê Rêkeftinê nexwestine çarçoveya parastinê ya ku Madeya 32an bi vî awayî behis dike, sînordar bikin, ango li gorî vê Madeyê têgeha »retkirina« penaberan, an vegerandina wan bi Neçarî, têgeheke xwedî çarçoveyeke berfirehtir e, û ji têgeha »derkirinê« cuda ye. Ji şiroveya Madeya 33an li gorî Madeya 32an ya Rêkeftinê, û nebûna mercê »hebûn bi şêweyê rewayî« di Madeya 33an de, tê têgiştin ku Madeya 33, bi niyaz, xwestiye çarçoveya parastinê ji bo hemî penaberan, dinav de jî penaberên ku bi şêweyekî ne yasayî derbas bûne, berfirehtir bike.

Rêkeftina Penaberan ya sala 1951ê, çarçoveya qedexekirina Vegerandina bi Neçarî, di Madeya 32an de berfirehtir kiriye, ku derkirina penaberên ku bi şêweyekî yasayî li herêmeke welêt, dimînin, qedexe kir, ji bilî derkirina ji ber sedemine girêdayî ewlekariya niştîmanî yan sîstema giştî. Di Madeya 33an de, ew çarçove berfirehtir kir ku derkirina penaxwazên ku statuya yasayî weke penaber wernegirtine, yan vegerandina wan bo sînorê herêmên ku jiyan an azadiya wan tê de li jêr gefa metirsiyê ye, jî li xwe girt, qedexe kir.

## 5. Vegera bi Neçarî ya bi nav Xwebexş

Dewlet ji bo vegerandina penaberan bi neçarî gelek rêbazên kevneşopî bikar tînin, ya herî gelemperî mîkanîzmên "Veqetandina Xakî" an jî navdewletîkirina hin deveran, weke sînorên deryayî û balafirxane û benderan. Navdewletîkirina deriyên sînorî dê sînorên navdewletî bike mijara xaka navxweyî, bi gotineke din dê penaberan ji hatina wan bi awakî karîger, bêpar bihêle, ku penaberan neçar dike bi vîna xwe vegerin. Ev şêwe ya herî navdar ya Vegerandina Bi nav Xwebexş e.

Di rastiyê de, Vegera Xwebexş yek ji girîngtirîn awayên çareseriyên domdar ên pirsgirêka penaberan e, serbarî bidawîbûna statuya penaberiyê ji ber nemana sedemên destêkî yên pejirandina penaberiyê (dawiya şer, û nebûna tirsa ji îşkenceyê, û şopandin, hwd.). Lêbelê, gumanên xurt li ser statuya "Xwebexşî" ya gelek keysên vegerê ku weke "Xwebexş" hatine binavkirin, hene, dinav de jî yên ku di bin çavdêriya Komisyariya Penaberan de pêk hatine. Dinava gelek ji van rewşan de, weke ku bi penaberên Afganî, û Sûdanî û Angolayî re rûdayî, berjewendiyên welatên mêvandar û yên bexşer li ser pişta berjewendiyên penaberan, hatine berçavbirin, ku penaber bi awayên corbicor hatine xapandin, weke qerebokirina diravî, yan tirsandina wan bi nêzîkbûna demê jidestdana mafê »Penaberiyê« [22].

Li gelek welatan, welatên Ewropî jî di nav de, siyasetin têne şopandin ku penaberan ji asta herî kêm a jiyana bi rûmet, bêpar dikin, heta ku neçar bibin "bi Xwebexşî" vegerin welatên xwe. Weke mînak, Komisyariya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekgirtî, got ku rêzikên Brîtanî yên

22 Katy Long, Xala bê Veger: Penaber û Maf û Vegera bo Welêt (OUP 2013) 147.

ku penaberan ji alîkariyên civakî bêpar dihêlin, digihin asta »Vegerandina bi Neçarî ya bi nav Xwebexş« [23]. Ji ber van rewşan, Fiqhên Dadwerî dan bi hebûna têgeha »Vegerandina bi Neçarî ya bi nav Xwebexş«, da[24]. Wek mînak, Kommenta Giştî ya Komîteya Rûbirûbûna Îşkenceyê, ku gotibû nabe welat »bi rêya rênima û siyasetine rêgir, penaberan ji bo vegerê, neçar bikin« [25]. Herwiha Komîteya Yasaya Navdewletî di pirojeya madeyên xwe derbarê »Derkirinê«, têgeha »Derkirina Bi nav Xwebexş« bi heman wateyê, binav kir[26].

da, «Vegera bi Neçarî ya bi nav Xwebexş» Dema, dadwerî û Fiqha Yasayî dan bi têgeha awayê pêwîst yê piştrastkirinê, cihê nakokiya Fiqhî ma. Pirojeya madeyên Komîteya Yasaya weke pîvan girt, ji xwe astem e ev «Niyaza dewletê di derkirina bi Neçarî» Navdewletî pîvan were piştrastkirin, ango welat danê bi niyaza xwe ya rasteqîne derbarê neçarkirina penaberan ji bo vegerê nadin, wate, binpêkirina pabendiyên xwe yên navdewletî bi şêweyekî xuyayî. Tevî wê yekê jî, di dozekê de, Hikûmeta Kîniyayê protestoya xwe nîşan da û got ku niyaza wê ji bo neçarkirina penaber û penaxwazan ji bo vegerê, bi rêya neçarkirina wan li ser Dibe ku» mana di hundirê kampine neguncaw de, tuneye, Komîteya Bilind ya vî welatî, got ku binpêkirina Prensîpa ne-Vegerandina bi Neçarî bi şêweyekî ne-rasterast were pêkanîn, û dibe ku encameke nepêşbînîkirî ya siyaseteke ku weke tê xuyakirin, ew siyaset ne ji bo binpêkirina .[27] «vê Prensîpê ye

Di dozeke din de, Dadgehê hebûna ne-Vegera bi Neçarî ya bi nav Xwebexş, piştrast kir - tevî ku ev peyv bi xwe bi kar neaniye- Dadgeha Ewropî ya Mafên Mirovan pîvana «Erêkirina Azad» ya penaber ji bo piştrastkirinê berçav girt. Di doza «M.S. li dijî Beljîkayê» penaberekî Îraqî bi tometa endamtiya rêxistineke tawankarî, û hevkarî û sextekirina belgeyan ji bo kesine ku peywendiya wan bi rêxistina «El-Qaida»yê re heye, hat girtin. Ew penaber li navendên koçberiyê hat girtin, û niştecêbûna wî hat sînordarkirin, di dawiyê de, wî penaberî dîportkirin bo welatê xwe, hilbijart. Dadgehê di biryara xwe de got ku «Ew kes li pêş van bijardeyan hat danîn: Biryar bide ku li Beljîkayê bimîne bê ti hêviya bidestxistina mafê niştecêbûna yasayî, û bê ti hêviyê ji bo jiyaneke bi azad, û bijardeya duyem veger bo Îraqê li gel egera metirsiya zîndankirin û reftara xirab li welatê xwe. Bijardeya sêyem jî çûn bo welatekî sêyem bû, ew yek ji aliyê praktîkî ve, ne mumkin bû. Dadgeh wiha dît ku, di van rewşan de, mercê Erêkirina Azad peyda nedibû» [28]. Dadgehê heman pîvan di dozeke din li Finlendayê sala 2019an, bikar anî[29].

Di dawiyê de, ji rêkeftin û peymanên navbera welatan de hatine imzekirin, herwiha ji şiroveya wê ya dadwerî û fiqhî, tê xuyakirin ku Prensîpa nepejrandina Vegerandina bi Neçarî ya penaberan, di naverok û çarçoveya xwe ya bicîkirinê de ji dema ku di Rêkeftina sala 1951ê de hatiye nivîsandin, berfireh bûye. Herwiha welatan (yên ku Rêkeftina sala 1951ê pesend kirine û yên ku pesend nekirine jî) dan bi wê Prensîpê weke bingeheke pabendker li gorî Yasaya Navdewletî ya Nerîtî, dane.

23 R v Wezîrê Derve yê Misogeriya Civakî, Encumena berê ya Hevbeş ya Xweşguzariya Benaberan [1997] 1 WLR 275, 283-4.

24 Weke mînak vê bixwîn ˝JA and Others v Director of Immigration [2011] HKCFI 10, para 82; 'Individual Opinion of Committee Members Yuval Shany and Konstantine Vardzelashvili (concurring)' in Warda Osman Jasin v Denmark UN doc CCPR/C/114/D/2360/2014 (25 September 2015) app 2, 14, para 2.

25 Komîteya Neteweyên Yekgirtî li dijî Işkenceyê (n 44) Movik 14.

26 Reşnivîsa gotaran (n 36) Made10.

27 Kituo Cha Sheria û kesine din li dijî Dozgerê Giştî [2013] eKLR, Movik 74

28 MS v Belgium, App No 50012/08 (ECtHR, 31 January 2012). Para. 124

29 NA v Finland, App No 2524418 (ECtHR, 14 November 2019) para 60.

# IV- Çarçoveyên yasayî û praktîka ku li Lubnan û Turkiyê li hemberî penaberên Sûrî, tên bicîkirin

## 1. Lubnan

### I- Çarçoveya yasayî

Lubnanê ne li ser Peymana Penaberan, û ne jî li ser Protokola sala 1967ê ya ku wê temam dike îmze nekiriye. Herwiha derbarê penaberan, yasayeke wê ya niştîmanî jî, tuneye. Tenê dinava yasaya sala 1962an ya girêdayî derbasbûn û niştecêbûna biyaniyan de, şeş made girêdayî penaberan hene. Di van madeyan de, çarçoveyeke zelal ku ewlekariya yasayî ya penaberan misoger bike, tuneye. Herwiha Hikûmeta Lubnanî, bi taybet di reftara xwe li hemberî penaberan, pabendî yasa û nivîsine din ên niştîmanî, dinav de jî destûra Lubnanî, nebû.

Tevî wê yekê, Lubnanê, di gelek helkeftan de, got ku ew bi îradeya xwe, hin xalên giring yên Rêkeftina sala 1951ê, bicî dike, herwiha dema ji bo serokatiya Encumena Mafên Mirovan sala 2006an xwe kandît kir, niyaza xwe ji bo pesendkirina vê nivîsê, nîşan da. Lêbelê takehelwêst di hemî daxuyanî û danûstandinên Hukûmeta Lubnanê de, pabendiya wê bi Prensîpa «ne-Vegera bi Neçarî ya penaberan» e[30].

Di hemî rewşan de, Lubnan li gorî statuya Nerîtî ya vê bingehê, bi vê Prensîpê, pabend e. Lêbelê, ji ber neguhartina yadaşnameyeke jihevtêgihiştinê navbera Lubnan û Komisyariya Penaberan, Lubnan danê bi statuya «penaberan» ku Komisyarî li Lubnanê dide Sûriyan, nade, bi wan re li ser bingeheke tawanî li gorî derbasbûn yan niştecêbûna ne rewayî li Lubnanê, reftar dike. Sala 2014an, Hukûmeta Lubnanê bi fermî siyasetek derbarê derbideriyê pesend kir, ku armanca wê ya hatibû ragihandin, kêmkirina hejmara penaberên Sûrî li Lubnanê, û handana wan ji bo vegera bo welatê xwe, bû[31].

Li gorî raportên Komisyariya Bilind a Karûbarên Penaberan, li Lubnanê 1.5 milyon penaberên Sûrî, hene. 90% ji wan li jêr hêla hejariyê dijîn[32], hevdemî wê yekê pêleke ku em dikarin nav lê bikin «dijatiya» Sûriyan heye ku hemahema derbasî qebareyên siyasî û yên olî li Lubnanê bûye[33]. Piştî ku Sûriyên ku ji şer reviyane bê vîze derbasî Lubnanê dibûn, herî kêm ji aliyê tiyorî ve, û bi bê lêçûn karta xwe ya niştecêbûnê nû dikirin, Rêveberia Giştî ya Ewlekariyê ya Lubnanî, tomarkirina Sûriyan ji aliyê Komisyariya Penaberan ve, qedexe kir, û ew rastî tedabîrine aloz û buha ji aliyê darayî ve ji bo nûkirina erêkirinên niştecêbûnê, kirin, ku bi wê yekê hejmareke mezin nikarîn niştecêbûna xwe ya rewayî bidest bihêlin.

Li gorî raporta «Nirxandina lawaziya rewşa penaberên Sûrî li Lubnanê» ya ku ji aliyê ajansên Neteweyên Yekgirtî yên li Lubnanê sala 2023an hatiye ragihandin[34], tenê 17% ji penaberên

30 M. Janmyr, "Welatek ji penaberiyê tuneye: Rewayetîkirina redkirina Lubnanê ya Rêkeftina Penaberan a sala 1951ê", Kovara Yasaya Penaberan a Navdewletî, Beşê 29, Jimare 3, Cotmeha 2017an

31 M. Janmyr, "Wirdekarî di Sirgûniyê de: Rewşa Yasayî ya Penaberên Sûrî li Lubnanê", Rapirsîna Çarmehî ya Penaberan, Beşê 35, Jimare 4, Berfanbara 2016an, r.58

32 Komisyariya Bilind a Karûbarên Penaberan, Danasîneke kurd li ser Lubnanê, Rawêjkariya Dawî di 7ê Çileya 2024an de.

33 "Bultena Nijadperestiyê ya Mehane" ya malpera "Nûçeyên"Exbar El-Saha" ya Lubnanî nûkirineke berdewam û bi êş a Gotara Kînê li dijî Penaberên Sûrî, pêşkêş dike. Û ji ber statuya Welatê Lubnanê, ji şehadetên hin penaberên Sûrî tê xuyakirin ku xalên pişkinînê û Saziyên Hevpeymanên Hukûmeta Sûriyê yên li Lubnanê, penaberan rastî praktîkine hovane jî dikin, ku wan weke dijberine egerkirî yên Hukûmeta Sûriyê, dibînin.

34 Nirxandina LawaziyaPenaberên Sûrî yên li Lubnanê, Gulana 2023yan.

Sûrî yên li Lubnanê, xwedî niştecêbûna rewayî ne. Ew yek tê wateya ku derdora 85% rastî rêgirtinine rasteqîne di jiyana xwe ya rojane de tên, weke rêgiriyên azadiya çûnûhatinê ji tirsa xalên pişkinînê, û bêparbûn ji xwendin û alîkariyên mirovî, û bêparbûn ji tomarên jidayîkbûnê û tomarên miriyan û yên zewacê. Ew yek jî vedigere risteyek ji rêzikên rêxistinî û reftarên praktîkî ku desthilatên Lubnanî li hemberî penaberên Sûrî ji demeke destpkî ji kirîza Sûriyê, bikar anîne, ew yek yasaya Lubnanî bi xwe binpê dike, serbarî binpêkirina pabendiyên Lubnanê yên navdewletî.

Destpêka sala 2015an, Desteya Ewlekariya Giştî biryarek derbarê mercên hatin û niştecêbûna Sûriyan derxist[35], ji ber wê biryarê hejmareke mezin ji penaberên Sûrî li Lubnanê, ji kaxezên niştecêbûnê yan ji nûkirina wan kaxezan, bêpar man, serbarî qedexekirina derbasbûna hejmareke din bo xaka Lubnanê. Ev biryar, li gorî Encumena Şêwirdariyê ya Lubnanî, ku bilindtirîn desteya dadweriya rêvebirî li Lubnanê ye, binpêkirineke eşkere ya yasaya Lubnanî û pabendiyên wê yên navdewletî ye. Encumenê, di biryara xwe ya 8ê Sibata 2018an, biryara Ewlekariya Giştî tune kir, ji ber ku ji aliyekî ne erkdar ve hatiye derxistin, ango li gorî yasayên Lubnanê, desthilata vê babetê ya Encumena Wezîran e. Encumenê got ku biryara Ewlekariya Giştî pêdiviyên rêkeftina hevkariyê ya navbera Komara Lubnanê û Komara Erebî ya Sûriyê, binpê dike, ku ew Rêkeftin tekeziyê li ser azadiya çûnûhatina kesan navbera Lubnan û Sûriyê, û azadiya niştecêbûn û kar, dike[36]. Lê, tevî tunekirina Dadweriya Lubnanî ji biryara navhatî ya Ewlekariya Giştî re, lêbelê fişara li ser penaberên Sûrî ji aliyê yasayî û praktîkî ve, bi şêweyekî metirsîdar bihtir bûye.

Di civata xwe ya 15ê Nîsana 2019an de, Encumena Bilind a Berevaniyê li Lubnanê, biryarek derbarê spartina alavên ewlekarî û yên leşkerî ji bo standina tedabîrên yekser ji bo qedexekirina derbasbûna Sûriyan bo Lubnanê bi rêyên ne fermî, stand. Ev biryar ku yekemcar e bi vî awayî derbarê reftara desthilatên Lubnanî bi penaberên Sûriyê re tê kirin, derkirina hemwelatiyên Sûriyê bi kom, ji aliyekî ve, û radestkirina wan bo desthilatên Sûriyê, ji aliyekî din ve, dipejirîne, bê ku metirsiyên ku rastî wan dê di vê rewşê de peyda bibin, berçav bên girtin[37]. Herwiha Rêvebirê Giştî yê Ewlekariya Giştî roja 13ê Gulanê biryara derkirina hemî hemwelatiyên Sûrî yên ku ne bi fermî piştî 24ê Nîsana 2019an derbasî Lubnanê bûne, stand, ew yek jî li gorî fermaneke Dozgeriya Giştî bê veguhestina wan bo dadgehê, û bê ti vekolîneke dadwerî derbarê hebûna her metirsiyekê li ser jiyan û azadiya wan li Sûriyê, bû.

Careke din, tê xuyakirin ku biryara Encumena Bilind ya Berevaniyê, û biryarên girêdayî wê hatine standin, binpêkirineke eşkere ya yasayên Lubnanî û pabendiyên navdewletî yên dewleta Lubnanî, ne. Ji aliyekî ve, Encumena Bilind ya Berevaniyê ne xwedî desthilat e ji bo standina biryara derkirina biyaniyan, ango yasaya biyaniyan ya Lubnanî vê desthilatê tenê dide desthilatên dadwerî piştî dadgehkirinekê ku derfeta pêşkêşkirina berevaniya guncaw li dijî biryara derkirinê, dide biyaniyan, û ji aliyekî din ve, eger yasa desthilata derkirina kesê biyanî dide aliyên ewlekarî di rewşine awarte de, weke rewşa ku hebûna wî kesê biyanî li ser xaka Lubnanî, gefê li ser ewlekariya giştî ya wî welatî dike, nabe ev derkirin bi kom be, ji ber ku pêdivî bi xwendina «gefa li ser ewlekariya giştî» ji bo her keysekê, bi cuda, heye. Herwiha, ev derkirin di rewşa penaberan de, ji bo welatê ku tê de li ser ewlekarî û silametiya xwe ditirsin,

35 Derbarê vê biryarê û guhertinên wê yên piştre, li Xeyde Frenciye binêre, "Berjewendiya Lubnanê di bêparkirina ji penaberên Sûrî ji Karta Niştecêbûnê de, çi ye?", Lênûska Yasayî roja 8ê Berfanbara 2016an; heman nivîskar "Lêxweşbûna hin penaberên Sûrî ji pereyên Karta Niştecêbûnê: Pêngava Yekem ji bo Gerentiya Parastina Yasayî", Lênûska Yasayî roja 13ê Sibata 2017an.

36 Derbarê vê biryarê, li Xeyde Frenciye binêre, "Şûraya Dewletê biryara Ewlekariya Giştî derbarê guhertina mercên derbasbûn û niştecêbûna Sûriyan li Lubnanê, jikar dixe, Waneyeke berçav ya Rewatiyê ye" Lênûska Yasayî roja 6ê Adara 2018an.

37 Derbarê vê biryarê, li Lênûska Yasayî binêre, "Encumena Bilind a Berevaniyê, Lubnanê tevlî dersînorkirina penaberên Sûriyê, dike: Praktîkên li dijî Desthilata Dadwerî û ya Ysasyî", Roja 29ê Gulana 2019an.

nabe[38]. Di dawiyê, de, rewşa ku yasaya Lubnanî rê dide aliyên ewlekarî ji bo derkirina kesê biyanî, tenê rewşa «Gefa li ser ewlekariya giştî» ye, ku ew bi xwe jî ne li gorî biryara Encumena Bilind a Berevaniyê bi xwe ye, û ne jî li gorî biryarên piştre yên ji aliyê desthilatên ewlekariyê hatine standin e. Ango ev hemî biryar li ser bingeha derbasbûna ne rewayî bo xaka Lubnanê hatine avakirin, ku ev yek di rewşa penaxwazan de, nayê pejirandin, serbarî ku gelek kesên ku ji bo Sûriyê hatine vegerandin, xwedî belgene niştecêbûneke yasayî li Lubnanê ne[39].

Li gorî van tedabîrên rêxistinî, desthilatên Lubnanî fişareke derûnî û rêbazkirî pêk tînin heta ku Sûriyan ji bo vegerê bo welatê xwe neçar bikin, dinav de jî, derkirina bi Neçarî ya herkesê ku derbasbûna wî ji bo Lubnanê bi şêweyekî ne rewayî hatibe piştrastkirin, û roxandin û şewtandina kampên penaberan, û armanckirina karkerên Sûrî yên ku erêkirina kar wernegirtine, li cihê karên wan, û girtina Sûriyan li ser xaline pişkinînê yên ewlekarî li hin taxan bi armanca derkirina wan, û derbasbûna cihên niştecêbûnê bi niyaza girtin û derkirina malbatan, herwiha jî derkirina zarokinan bê malbatên wan.

## II- Pratîkên li hember penaberan

Di heman roja ku biryara derkirina penaberên Sûrî yên ku bi awayekî ne rewayî derbasî Lubnanê bûne, hat pesendkirin, Encumena Bilind a Berevaniyê li Lubnanê biryara roxandina banên simentî yên xaniyên penaberan li kampan, derxit, moleta 10 rojan ji bo bicîkirina biryarê da penaberan an jî Artêş dê van banan biroxîne[40]. Beriya wê yekê jî Artêşa Lubnanî gelek kon li kampa El-Yasemîn li navçeya Bir Elbas (El-Bîqa`) roja 24ê Nîsana 2019an, bê hişdariyeke bêşdem, roxandin.

**Di rastiyê de, derkirina penaberên Sûrî ji Lubnanê bi Neçarî ji beriya çend salan ve, destpê kiriye, Rêveberiya Giştî ya Ewlekariyê li Lubnanê, sala 2021ê, derkirina 6345 penaberan sala 2019 an, ragihand, û ew yek bi Vegera Xwebexş binav kir.**

Di rastiyê de, derkirina penaberên Sûrî ji Lubnanê bi Neçarî ji beriya çend salan ve, destpê kiriye, Rêveberiya Giştî ya Ewlekariyê li Lubnanê, sala 2021ê, derkirina 6345 penaberan sala 2019an, ragihand, û ew yek bi Vegera Xwebexş binav kir. Rêjeya derkirina bi Neçarî û ya bêserûber ji destpêka Çileya 2023an ve, zêde bûye. Li gorî jêderine karê mirovî li Lubnanê, ku ji bo Hiyûmen Rayîts Wotş axivîne, navbera Çile û Tîrmeha sala 2023an de, sed operasiyonên êrîşbirin û girtina 20200 penaberî û derkirina 10800 ji wan bo Sûriyê, hatine belgekirin[41]. Ev yek di wê demê de ye ku Komisyariya Neteweyên Yekgirtî ya Penaberan tekez dike ku ew nikare bangewaziyê yan rêxweşkirina derkirina penaberên Sûriyê bike, ji ber ku li gorî nirxandina wê, hîn Sûriye welatekî ne aram e ji bo penaberan[42].

38 Heman Çavkanî.

39 Li movika 3 ya li jêr û yên piştî wê, binêre.

40 Lênûska Yasayî, "Encumena Bilind a Berevaniyê, Lubnanê tevlî dersînorkirina penaberên Sûriyê, dike: Praktîkên li dijî Desthilata Dadwerî û ya Ysasyî", Roja 29ê Gulana 2019an.


41 Hiyûmen Rayits Wotş, "Lubnan: Bi biryarine bilez, Hêzên Çekdar Sûriyan dersînor dikin", 5ê Tîrmeha 2023yan.

42 Weke mînak, li vê binêre :https://www.unhcr.org/lb/protection

**Navenda Wisûl ya Mafên Mirovan (ACHR) di raporteke xwe de ku 19ê Gulana 2023ê hatiye belavkirin, got ku:**

> **«Ji Nîsana 2023an ta 16ê Gulana 2023an, )...) herî kêm 22 operasiyonên êrîşbirinên ewlekarî ku Artêşa Lubnanî li cihên niştecêbûna penaberine Sûrî li gelek deverên Lubnanê, encam dane, belge kirine, serbarî belgekirina herî kêm du xalên pişkinînê yên ewlekarî yên demkî, ku yek ji wan li Coniye û ya din li meydana El-Rîhab li Zehleyê, bû. Bi wê yekê bihtirî 808 pebarî bi hovane hatin girtin (dinava wan de 17 penaberên xwedî belgene yasayî yê niştecêbûnê, û 13 jin, û 24 penaberên jêr 18 salî, û du penaberên hevregezxwaz, hebûn), hin ji wan rastî lêdan û/yan reftara dijwar û/yan sivkatiyê li ser destê endamine Artêşa Lubnanî, hatin. Herwiha herî kêm 334 ji wan penaberên girtî/desteserkirî ji bo derveyê sînorê Lubnanê bi Neçarî hatin derkirin (dinava wan de 12 penaberên xwedî belgene yasayî yê niştecêbûnê, û 13 jin, û 22 penaberên jêr 18 salî, û du penaberên hevregezxwaz, hebûn).**
>
> **75 penaberî ji penaberên ku hatine derkirin ji bo ACHR gotine ku desthilatên Sûrî ew dubare radestî qaçaxçiyên mirovan ên li ser sînorê Lubnanê kirin, û bi wan re danûstandin ji bo vegerandina wan bo Lubnanê beramberî derdora 150 û 300 dolarên Amrîkî ji bo her kesekî, kirin, ku gehişt 3000 dolarên Amrîkî ji bo kesên ku rastî metirsîne ewlekariya rasterast li Sûriyê, tên. 51 ji wan penaneran gotin ku Artêşa Lubnanê ew rasterast radestî desthilatên Sûriyê kirin" [43].**

**808 pebarî bi hovane hatin girtin,herî kêm 336 ji wan penaberên girtî/desteserkirî ji bo derveyê sînorê Lubnanê bi Neçarî hatin derkirin, dinava wan de:**




43 Navenda Wisûl ya Mafên Mirovan, "Bi dersînorkirina penaberan bi Neçarî, Lubnan Mafên Mirovan piştguh dike", 19ê Gulana 2023yan.

Serbarî van bûyerên ku Navendê rasterast belge kirine, 32 operasiyonên êrîşbirina ewlekarî yan rêbendine ewlekarî ku ji aliyê alavinên ragihadinê û platformên peywendiya civakî ve di heman demê de, hatine belavkirin, belge kirine, herwiha hejmara penaberên ku bi hovane hatine girtin gehişt 900 - 1400 kesî, û li gorî heman jêderan, hejmara keysên derkirina bi Neçarî di dema hilmeta ewlekariyê ta sibeha roja Sêşemê 16ê Gulana 2023an, gehişt 700 keysî. Di qunaxeke piştre de, Ajansa Ragihandinê ya Niştîmanî ya Lubnanî ragihand ku dinavbera 7-24ê Gulana 2023an, 301 hemwelatiyên Sûrî ji bo welatê xwe hatine derkirin.

**Di hevdîtina penaberekî Sûrî (A.A.) ku li Beyrûtê dimîne, li gel Navenda Sûriyê ya Azadiya Ragihandinê de, roja 13ê Berfanbara 2023an, wî penaberî behsa êrîşa Artêşa Lubnanî li ser hin endamên malbata wî li kampa Qib Elyas li El- Bîqa`, kir, ku 60 ciwanên ku ji bo leşkeriya Neçarî li Sûriyê dawazkirî ne, girtin, û ew vegerandin Sûriyê. Dinava wê komê de, birayê wî şahidhalî hebû, tevî ku birayê wî ji sala 2014an ve li Lubnanê bi awayekî rewayî dimîne û karta wî ya penaberiyê ya Komisyariya Penaberan jî, hebû. Piştî çend rojan, birayê wî peywendî li gel kir û got ku ew ji bo leşkeriya Neçarî hatiye birin, û dest bi rahênana leşkerî li Der`ayê kiriye.**

**Şahidhalekî din (R.A.) behsa bûyera girtina bîst ciwanên Sûrî, destpêka Nîsana 2023an, kir û got dema ew diçûn karê xwe, ji aliyê xaleke fermî ya pişkinînê ya leşkerî ku di rastiyê de, bi ser Hizbullahê ve ye, û ew ciwan ji bo Sûriyê hatin derkirin, dinava wan de kurxaltîkê wî şahidhalî hebû ku li Lubnanê bi şêweyekî yasayî dimîne û belgeya wî ya Komisyariya Penaberan jî heye, piştre malbatê zanî ku ew niha li girtîgeha Sêdnayayê zîndankirî ye.**


Penaberên Sûrî dema ku vedigerin, rastî metirsiyên zîndankirin û işkence û bi leşkerkirina bi Neçarî di çarçoveya şerekî xwîndar, tên. Di hevdîtina penaberekî Sûrî (A.A.) ku li Beyrûtê dimîne, li gel Navenda Sûriyê ya Azadiya Ragihandinê de, roja 13ê Berfanbara 2023an, wî penaberî behsa êrîşa Artêşa Lubnanî li ser hin endamên malbata wî li kampa Qib Elyas li El-Bîqa`, kir, ku 60 ciwanên ku ji bo leşkeriya Neçarî li Sûriyê dawazkirî ne, girtin, û ew vegerandin Sûriyê. Dinava wê komê de, birayê wî şahidhalî hebû, tevî ku birayê wî ji sala 2014an ve li Lubnanê bi awayekî rewayî dimîne û karta wî ya penaberiyê ya Komisyariya Penaberan jî, hebû. Piştî çend rojan, birayê wî peywendî li gel kir û got ku ew ji bo leşkeriya Neçarî hatiye birin, û dest bi rahênana leşkerî li Der`ayê kiriye. Şahidhalekî din (R.A.) behsa bûyera girtina bîst ciwanên Sûrî, destpêka Nîsana 2023an, kir û got dema ew diçûn karê xwe, ji aliyê xaleke fermî ya pişkinînê ya leşkerî ku di rastiyê de, bi ser Hizbullahê ve ye, û ew ciwan ji bo Sûriyê hatin derkirin, dinava wan de kurxaltîkê wî şahidhalî hebû ku li Lubnanê bi şêweyekî yasayî dimîne û belgeya wî ya Komisyariya Penaberan jî heye, piştre malbatê zanî ku ew niha li girtîgeha Sêdnayayê zîndankirî ye.

Di rapirsiyeke din a Navenda Sûriyê ya Azadiya Ragihandinê, dawiya Berfanbara 2023an, ku 27 kesên ku ji aliyê desthilatên Lubnanî û Turkî ve, ji bo Sûriyê hatine vegerandin, li xwe digre, eşkere tê xuyakirin ku derkirina Sûriyan ji Lubnanê, bi piranî bi şêweyekî hovane tê kirin, û di baştirîn şêwe de weke şûngir ji hin sizayên tawankarî, tê encamdan. Dinava kesên ku bejdarî rapirsiyê bûne, kesine ku li golanan hatibûn girtin tevî ku belgeyên wan ên niştecêbûna bi rewayî jî hebûn, hin ji wan ji zîndanê yekser bo xaka Sûriyê hatin vegerandin. Di herdu rewşan

de jî, ew kes ji bo desthilatên Sûriyê hatibûn radestkirin, tevî egera hebûna metirsiyan jî li ser wan kesên ku hatine derkirin. 51% ji kesên bejdarî rapirsiyê bûne, rastî işkence û reftareke xirab û sivkatiyê li ser destê hêzên ewlekariya Sûriyê, hatine, herwiha rastî istixlala darayî hatine. Ji vê rêjeyê, 78% azadiya xwe bi bertîlan vegerandine. 92% ji kesên bejdarî rapirsiyê bûne, wate derkiriyên ji Lubnan û Turkiyê, nekarîne xanî û zeviyên xwe vegerînin, an ji ber ku hatine roxandin, an ji aliyê desthilatan ve hatine desteserkirin, an çûna wan bo xanî û zeviyan estem e ji ber sedemine girêdayî dijberan an girêdayî daxwazkiriyên leşkeriya Neçarî. Herwiha 73% ji kesên bejdarî rapirsiyê bûne gotin ku wan nikarîne kar li ser kaxez û belgeyên xwe yên kesî yên giring, bikin, hemî bejdarbûyan gotin ku ew li Sûriyê ne di aramiyê de ne, ne ew bi xwe û ne jî malbatên wan.

Di derencamê de, serbarî zehmetiya ku li penaberên Sûrî yên li Lubnanê bi taybet ji ber kirîza aborî ya Lubnanê, dikişînin, û ji ber lawaziya rewşa wan a yasayî ji ber nezelaliya yasayên Lubnanî yên peywendîdar, reftarên bêserûber ên hêzên Artêş û Ewlekariya Lubnanê li hemberî wan jî heye, ev hemî jî hevdemî hilmeta kînê ku zêdetir dibe. Rojane penaberên Sûrî yên li Lubnanê rastiya Vegera bi Neçarî di çarenivîsa bi sedan ji nas û kesûkar û cîranên xwe de, dibînin, tirsa wê di dilê hemiyan de ye. Praktîkên Hukûmeta Lubnanê, di binpêkirineke eşkere û xuya ya Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî, de, ku wê bi xwe li ser pabendiyê imze kiriye, tê xuyakirin, herwiha binpêkirina pabendiyên xwe li gorî gelek sozname û peymanên din jî, ji wan ên girêdayî bi tunekirina hemî şêweyên nijadperestiya li dijî jinê, û rûbirûbûna işkenceyê, û Peymana Navdewletî ya taybet bi Mafên Sivîl û yên Siyasî, û peymana girêdayî Mafên Zarokan.

**Di rapirsiyeke din a Navenda Sûriyê ya Azadiya Ragihandinê, dawiya Berfanbara 2023an, ku 27 kesên ku ji aliyê desthilatên Lubnanî û Turkî ve, ji bo Sûriyê hatine vegerandin**



## 2. Turkiye

Li gorî serjimêriyên Komisyariya Bilind a Karûbarên Penaberan, niha li Turliyê 3.6 milyon penaberên Sûrî ku li Komisyariyê tomarkirî ne, hene. Ku ji destpêka şerê navxwe yê Sûriyê sala 2011an, ve dest bi hatinê bo Turkiyê kirin, navbera herdu salên 2015 - 2016, hevdemî êrîşên Artêşa Sûriyê bi piştevaniya Rûsiyayê, ku di wan êrîşan de, piraniya bajarên li naverast û Bakurê Sûriyê, vegerandin, pêline mezin ya hatina penaberan, rûdan.

Di destpêkê de, hebûna wan tenê li wîlayetên sînorî bû, piştre Hukûmeta Turkiyê hewl da ku penaberên Sûrî dubare li ser wîlayetên din ên Turkiyê dabeş bike. Li gorî lêkolîneke Navenda El-Hîwar El-Sûrî, ku Îlûna 2023an hatiye belavkirin, bi giştî, «sê navçeyên hebûna Sûriyan li Turkiyê hene:

* Wîlayetên ku piraniya Sûriyan lê dimînin (80% ji Sûriyan), 11 wîlayet ji eslê 81 wîlayetên Turkiyê ne[44].
* Wîlayetên ku derdora 16% ji Sûriyan lê dimînin: 19 wîlayet in[45], li van wîlayetan navbera 10 - 100 hezar Sûrî, dimînin.
* Wîlayetên ku kêmî 10 hezar Sûrî li her wîlayetê dimînin: Ew wîlayetên ku ji bo bidestxistina Kimlikê ji naverasta 2022 ta destpêka 2023an, rê xweş dikir, piştî ku 48 wîlayetan tomarkirina Sûriyên lê dimînin, rawestand[46]; wate, li 78 wîlayetan datayên Sûriyan hene» [47].

## I- Çarçoveya yasayî ya parastina penaberên Sûriyê:

Turkiyê li ser Rêkeftina Penaberan bi têbîniyekê imze kir, ku statuya «penaber» tenê dide hemwelatiyên welatên Ewropayê. Herwiha Turkiyê Peymana Ewropî ya Mafên Mirovan, û Soznameya Navdewletî ya Mafên Sivîl û yên Siyasî, û Peymana Rûbirûbûna Işkenceyê, pesend kiriye. Ev peyman, Turkiyê bi ne-Vegera bi Neçarî ya penaberan, bê berçavbirina regeznameyên wan, pabend dike.

Tevî hatina pêl bi pêl ya penaberên Sûrî ji sala 2011an ve bo Turkiyê, lê beriya sala 2014an, ti çarçoveyeke yasayî ya zelal ji bo birêkxistina rewşa wan, tune bû. Yasaya Turkiyê rewşa penaberên Sûrî dike di çarçoveya du nivîsên bingehîn de; Madeya 91ê ya Yasaya Biyaniyan û Parastina Demkî, û Lîsta Parastina Demkî. Sala 2013an, Madeya 91ê bû bingeheke yasayî ji bo parastina demkî. Lêbelê Turkiyê tenê li ser vê nivîsê tekez kir «Turkiyê dikare parastina demkî bide biyaniyên ku neçar bûne ji welatên xwe derkevin, yan nikarin vegerin welatên xwe, yan kesên ku ji bo bidestxistina parastineke demkî ya rasterast, gehiştine Turkiyê , yan bi kom sînorê Turkiyê derbas kirine». Xala duyem a vê Madeyê, dibêje ku divê tedabîrên pêwîst ji bo pêşwaziya wan û destnîşankirina maf û erkên wan, li gorî lîsteyeke Encumena Wezîran, were birêkxistin.

---

44 Ev wîlayet in: Istenbol û Xazî Êntap û Şanlî Orfa û Hatayî û Edene û Mêrsîn û Bûrse û Izmîr û Qoniye û Mer`ş û Kilis.

45 Ev wîlayet in: Enqere û Mêrdîn û Qeyserî û Osmaniye û Malatiya û DiyarBekir û Adîman û Skariya û Dênizlî û Manîsa û Nîvşehir û Batman û Şirnex û Îlazix û Tikirdax û Afyon Hîsar û Mogla û Bordum û Kocalî.

46 Ev wîlayet in: Samsûn û Aydin û Sparte û Iskî Şehir û Nîgde û Yozgat û Entaliya û Balik Şehir û Tişanakle û Sêrt û Bolo û Aksarayî û Yilwa û Sîwas û Trabzon û Tişorum û Oşak û Qistimano û Kiraklî û Kêr Şehir û Wan û Kotahiye û Mûş û Karbûk û Dozcî û Amasiya û Bingol û û Rîza û Agrî û Tukat û Ordu û Bidlîs û Erzerûm û Şinikrî û Zongildax û Bilcik û Edirne û Bartîn û Gîrson û Sînop û Qaris û Irzencî û Gimoşhane û Erdhan û Ixdîr û Erteqîn û Baybûrt û Toncalî û Hakarî.

47 Navenda El-Hîwar ya Sûrî, "Datayên Sûriyan li Turkiyê; hejmar diaxivin", 19ê Berfanbara 2023yan.

Encumena Wezîran ev lîste[48] roja 22ê Cotmeha 2014an, pesend kir, û heman rojê kete warê bicîkirinê[49]. Li gorî wê, ji mafê penaberên Sûrî ye yên ji Sûriyê hatine, piştî tomarkirina wan ji aliyê desthilatên Turkiyê, yekser mafê karta parastina demkî, bidest bixin, û agahiyên giring bi zimanê xwe yê dayîk, werbigirin, û karta kesayetî bidest bixin, û sûdê ji gerentiya tenduristî ya bingehîn bibîne. Herwiha nabe Sûrî tenê ji ber sedema derbarbûna wan bo xaka Turkiyê bi şêweyekî ne rewayî, werin desteserkirin, û ji mafê wan e ku sûdê ji alîkariya civakî û xizmetguzariyên giştî, û ji piştevaniya yasayî, bibînin. Sûriyên tomarkirî dikarin zarokên xwe bişînin dibistanên Turkiyê. Herwiha ji Çileya 2016an ve, ji mafê Sûriyan e ku li Turkiyê kar bikin, lêbelê li gorî tedabîrine aloz û li jêr mercine corbicor.

Li gorî lîsteya pesendkirî ya sala 2014an, eger kartên penaberên Sûrî yên parastina demkî biser de neçûbin, xwestekên wan ên penaberiyê ku bo Komisyariya Penaberan hatine pêşkêşkirin, nayên xwendin, di rastiyê de, ev yek tê wateya ku, eger heye penaberên Sûrî li Turkiyê statuya penaber li gorî ku Rêkeftina sala 1951ê dide wan, qet bidest nexin. Û li gorî Madeya 11an a lîsteya sala 2014an, dibe ku parastina demkî ya her kesekî, bi biryareke Encumena Wezîran, were bidawîkirin. Di çarçoveya estemiya bidestxistina statuya penaber li Turkiyê, Sûrî li pêş sê bijardeyan in: Entegrasiyona dawî dinava Turkiyê de, yan dubareniştecêbûn, yan Vegera Xwebexş. Madeya 14an a lîsteya sala 2014an dibêje ku çareseriya dawî ya sûdmendên parastina demkî, Vegera Xwebexş e. Madeya 42an a heman lîsteyê dibêje divê rê li ber vegera wan a Xwebexş bi hevkarî li gel rêxistinên navdewletî yên ne hukûmî, were hesankirin. Lêbelê hin lêkolînan piştraskirin ku siyaseteke Turkiyê ya tevahî ji bo entegrasiyonê, tuneye[50], li gorî Komisyariya Penaberan derfetên dubareniştecêbûnê pir kêm in[51].

Jêdera pirisgirêka rasteqîne, û metirsiya ku rastî penaberên Sûrî li Turkiyê tên, ne tenê ji çarçoveya yasayî ye, tevî gerentiyên destnîşankirî ku peyda dike, lêbelê ji siyaseta Vegera bi Neçarî ku li gorî raportên rêxistinên navdewletî yên mafên mirovan, êdî bi şêweyekî rêbazkirî û hemahengkirî, û li jêr lîstikeke eşkere bi nivîsên yasayî tê encamdan, tê. Ji ber ku ev Veger ne li ser daxwaza penaberên Sûriyê, û ne jî li ser guhertina rewşan li hundirê Sûriyê tê avakirin, lêbelê li ser bingehine siyasî, û carinan li ser bingehine hilbijartinî yên navxweî ye. Ji xwe pêla dijatiyê li hemberî Sûriyan, bi dirêjahiya salan, zêde bûye, û hevdemî kirîza aborî, kûrtir bûye, ku di dema hilmeta hilbijartian de gehişt asta herî bilind, ango gotara kînê li dijî Sûriyan bûye babeteke normal[52].

Li hemberî vê pêla dijatiyê, siyasetmedarên Turk, pêşbirkî dikirin, Serokkomarê Turkiyê Receb Teyb Erdogan di naverasta Tîrmeha 2019an de, got: «Ji ber karvedanên hemwelatiyan, pêwîstiya me bi darîştina siyastine nû ye ji bo Sûriyan, Em ê wan ji bo vegerê, han bidin» [53].

48 Komara Turkiyê, Yasaya Parastina Demkî (22yê Cotmeha 2014an) http://www.goc. gov.tr/files/_dokuman28.pdf.

49 Tevî ku Yasaya Turkiyê di cih de mafê derbasbûna xaka Turkiyê nade kesên ku digihin sînorê wê, lêbelê di destpêkê de Turkiyê di siyaseta Deriyê Vekirî de li hemberî penaberên Sûrî, berdewam bû. Berê, pêwistiya Sûriyan bi Vîzayê ji bo derbasbûna xaka Turkiyê nebû, lêbelê ji Çileya 2016an ve, Turkiyê mercê wergirtina Vîzayê ji bo Sûriyên ku ji welatekî sêyem tên, danî.

50 K Kirisci û E Ferris, 'Egera Vegerê bo Welêt tuneye: Penaberên Sûrî û Astengiyên ku rastî Turkiyê - û Civaka Navdewletî, tên' (Enstîtuya Brookings 2015) 11 https://www.brookings. edu/wp-content/uploads/2016/06/Turkey-Policy-Paper-web.pdf.

51 HCR Raporta Turkiyê

52 Penaberên Sûrî li Turkiyê: Eşkerekirina Çîroka Têgehên Çewt, Destpêşxeriya Çaksaziya Erebî, 19ê Tîrmeha 2023yan.

53 Di Raporta Rêxistina Lêborînê ya Navdewletî ya bi Navnîşana "Berê te li mirinê ye" Binpêkirinên li dijî Penaberên Sûrî yên ku vedigerin Sûriyê" de hatiye, Çapa Ingilîzî, r.13.

## II- Praktîkên li hemberî penaberan:

Bi salan e, rêxistinên navdewletî yên mafên mirovan gelek caran behsa pêline Vegera bi Neçarî ya bi nav Xwebexş ya penaberên Sûrî yên li Turkiyê dikin. Rêxistina Lêborînê ya Navdewletî di raporta xwe[54] ya Cotmeha 2019an de eşkere kir ku Turkiyê di mehên beriya operasyona xwe ya leşkerî li Bakurê Rojhilat û amadekariya avakirina "Herêmên Aram" li hundirê Sûriyê, bi awayekî rêbazkirî, penaberên Sûriyê bi Neçarî Vegerandine. Di dema ku Turkiyê dibêje ku ew bi Neçarî Sûriyan venagerîne, û mikur hat ku hejmareke mezin ya penaberan biryara Vegera xwebexş dane, Rêxistinê eşkere kir ku hemû kesên ku hevdîtin bi wan re kirine, bi gef û işkenceyê ji bo vegerê, hatine neçarkirin.

Hin şahidhalan, dane xuyakirin ku Sûriyên hatine desteserkirin, li ser zîndankirina çend mehan li Turkiyê, yan vegera yekser bo Sûriyê, hatin bijardekirin. Ji hin penaberên din hat xwestin ku li ser kaxezên Vegera Xwebexş bi zimanê Turkî, imze bikin, û karmendên navenda desteserkirinê li şûna wan li ser wergera erebî ya wan kaxezan, imze kirin. Derfeta xwestina alîkariya parêzeran ji bo penaberên ku Rêxistina Lêborînê ya Navdewletî hevdîtin bi wan re kirine,nehat dayîn, lêbelê gefa «mana di zînanê de heta şeş yan heft mehan li wan hat xwarin eger daxwaza alîkariya parêzerekê bikin» [55]. Hin kesên ku bi Neçarî hatine vegerandin, gotin ku hin zarok jî bê malbatên xwe, bi behaneya ku kartên wan yên nasnameya kesî, tunene, hatine vegerandin.

**Hin şahidhalan, dane xuyakirin ku Sûriyên hatine desteserkirin, li ser zîndankirina çend mehan li Turkiyê, yan vegera yekser bo Sûriyê, hatin bijardekirin gotin ku hin zarok jî bê malbatên kesî, tunene, hatine vegerandin.**

Rêxistina Hiyûmen Rayits Wotş[56], di raporteke xwe ku Cotmeha sala 2022an derketiye, got ku desthilatên Turkiyê bi sedan Sûrî bi Neçarî derkirne. Di vekolîna Rêxistinê de hatiye xuyakirin ku penaberên peywendîdar, bi şêweyekî hovane li cihên karên xwe, yan xwendina xwe, yan li kolanê yan jî li malên xwe, hatibûn desteserkirin. Hemûyan jî tekez kirin ku ew li «Navenda Tozla ya derkirinê» hatibûn zîndankirin, herwiha rastî reftara xirab û işkenceyê hatin, û piştre li hatin neçarkirin ku li ser belgeyên Vegera «Xwebexş» bo Sûriyê, imze bikin. Dîsan dinava desteserkiriyên ku hatibûn zîndankirin, zarok jî hebûn û ji bo Sûriyê hatin Vegerandin[57].

Şehadetên ku di Îlona 2023an de ji aliyê Navenda Sûriyê ya Azadiya Ragihandinê ve hatine bidestxistin, praktîkên Turkiyê li hemberî penaberên Sûriyê piştrast dikin. Yek ji şahidan bi navê (R.X.) ku li Qeterê dimîne, ji Qeterê ji bo çareseriya pizîşkî û bi vîzayê derbasî Turkiyê bûbû, li herêma Aksarayê ji aliyê polîsên Turkiyê ve hat desteserkirin û 24 rojan li navendeke girtinê ma bê ku rê bidinê ku peywendiyê li gel malbata xwe yan parêzerê xwe bike, piştre ji bo Sûriyê li gel bi dehan Sûrî roja 23ê Hizêranê, bi rêya Dergehê Bab El-Selam, hat derkirin. Wî Şahidhalî diyar kir ku sed penaberên ku imzekirina belgeyên Vegera Xwebexş red kirin, li ser destên hêzên ewlekariya Turkiyê rastî işkenceyê hatin, piştre di vîdiyoyan de bi Neçarî gotin ku ew bi vîna xwe dixwazin vegerin Sûriyê. Şahidhalekî din rastî gefa birina zarokên wî bo saziyên civakî hat, eger li ser belgeyên Vegera Xwebexş, imze neke.

---

54 Heman Çavkanî.

55 Rêxistina Lêborînê ya Navdewletî, "Turkiye: Ew Sûriyên ku bi şêweyekî ne yasayî ji bo şer, beriya amadekirina Navçeya Aram 'ya pêşbînîkirî', hatine dersînorkirin", 25ê Cotmeha 2019an.

56 HRW, "Turkiye: Bi sedan Penaber ji bo Sûriyê hatin dersînorkirin" 24ê Cotmeha 2022yan.

57 Penaberên Navdewletî, "Bi rêya Erd yan bi rêya Deryayê: Penaberên Sûrî hizra Pêşeroja xwe dikin", 13ê Cotmeha 2023yan.

Ji şehadetên ku Navenda Sûriyê ya Azadiya Ragihandinê bidest xistine, tê xuyakirin ku praktîkine rêvebirî yên rêbazkirî bi rêya desteserkirina hovane, yan şantajkirina penaberan yan işkenceya wan ji bo neçarkirina wan li ser imzekirina belgeyên Vegera Xwebexş, hene, herwiha hêzên Ewlekariyê yên Turkiyê bi rêya tomarên vîdiyoyan dixwazin bibêjin ku kesên desteserkirî di rewşeke guncaw ya desteserkirinê de dimînin, ji aliyekî ve, û ji aliyekî din ve ta ku bidin xuyakirin ku wan bi vîna xwe biryaya vegerê dane. Heman encam di rapirsiyeke Navendê di dawiya Berfanbara 2023 de, hatin piştrastkirin.

Newekheviya amarên taybet bi penaberên Sûrî li Turkiyê, û bi taybetî yên «Kesên bi xwebeş vegeriyane», hin rûyên van praktîkan eşkere dikin. Navenda Sûriyê ya Azadiya Ragihandinê gotiye ku amarên ku li ser malpera Rêbeveriya Koçberiyê ya Turkiyê hatine belavkirin, bi şêweyekî gumandar tên guhertin, dibe ku dinavbera rojekê û roja din de 200.000 kêm bibin. Herwiha statuya rêbazkirî ya Vegerandina bi Neçarî wekî praktîkeke rêvebirî ji ber nebûna kontirolê yan newekheviya amarên fermî, tê. Li gorî raporta Navenda El-Hîwar ya Sûrî[58]:

**“Valahî û newekheviya amarên belavkirî tê dîtin; weke mînak: Sala 2021ê û sala 2023an, Wîzareta Berevaniyê di du daxuyaniyan de tomarkirina bihtirî milyonek keysên «Vegera Xwebexş» ragihand, lêbelê di Tîrmeha sala 2023an de, Serokkomarê Turkiyê Erdogan got ku hejmara kesên ku vegeriyane 600 hezar kesî derbas kiriye. Li gorî daxuyaniyên berpirsan, Amarên Wîzareta Navxwe jî ne wek hev in; di du daxuyaniyên Cîgirê Wezîrê Navxwe de, gotibû ku hejmara «Kesên bi Xwebeş vegeriyane» di Gulana sala 2022an gehişt derdora 497926 kesan, û meha piştre zêde bû û gehişt 507292 kesan, cudahiya navbera wan 9366 kes di yek mehê de bû; li gorî datayên derwazeyên sînorî di wê salê de, ew yek ducaran li rêjeya mehane ya hejmara kesên vegeriyane ye. Daxuyaniyên Wezîrê berê yê Navxwe di Gulana sala 2022an de amaje bi hejmara «Kesên bi Xwebeş vegeriyane» kir ku gehişt 502000 kesî, ev hejmar ne li gorî daxuyaniyên Cîgirê Wezîrê Navxwe ne ku di beriya demeke nêzîk de derketibûn, herwiha piştî derdora 5 mehan, Wezîrê Navxwe ragihand ku hejmar gehişt 529000 kesî, bi cudahiya 27 hezar kesî; ew yek nîvê hejmara ku di datayên derwazeyên sînorî de hatiye ye, bi rêjeya 6750 kesan mehane, di Gulana sala 2023an de dîsan got ku hejmar gehişt 554000 kesî, bi cudahiya 25 hezar kesî di heyama 7 mehan de».**

Tê xuyakirin ku ne yasa û ne jî praktîkên Turkiyê li hemberî vegera penaberên Sûriyê, ne li gorî pabendiyên navdewletî yên wî welatî ne, berovajiyê wê yekê, di binpêkirina pabendiyên navdewletî yên Turkiyê de berdewam dikin. Li gorî Rêkeftina sala 1951ê, Vegera bi Neçarî binpêkirneke cuda ye ji mafê ku Turkiyê ji bo xwe derbarê dana statuya penaber tenê ji bo hemwelatiyên Ewropayê, bidest xist. Serbarî ku bingeha vê pabendiyê Yasaya Navdewletî ya Nerîtî ye, herwiha statuya wê ya girêbestî ji bo Turkiyê.

58 Navenda El-Hîwar ya Sûrî, “Datayên Sûriyan li Turkiyê; hejmar diaxivin”, 19ê Berfanbarê

Serbarî wê yekê, bi Vegerandina Neçarî ya penaxwazên Sûrî, Turkiye pabendiyên xwe li gorî Peymana Ewropî ya Mafên Mirovan, bi taybet Madeyên 3 û 5 û 15 yên girêdayî qedexekirina işkenceyê, û mafê azadî û ewlehiyê, û nepabendiya bi Rêkeftinê di rewşên awarte de, binpê dike[59].

Bi Vegerandina Neçarî ya penaberên Sûrî, Turkiye pabendiyên xwe li gorî Peyman Navdewletî ya Mafên Sivîl û yên Siyasî binpê dike. Komîteya Mafên Mirovan di şiroveya xwe ya giştî ya jimare 20 de wiha nirxand ku «Divê welatên peymandar, bi rêya radestkirin yan dersînorkirin an vegerandin bo welatekî din, kesan rastî metirsiya işkenceyê yan reftar yan sizaya dijwar yan ya ne mirovî yan ya sivkatiyê, nekin[60]». Herwiha di Kommenta xwe ya Giştî ya jimare 31 de wiha nirxand ku «Pabendiya ku madeya 2 feriz dike (Divê welatên peymandar rêzgirtin û gerentiya mafên ku dinava Peymanê de hatine ji bo hemî kesên li ser xaka wan dinîmin, û ji bo hemî kesên ku li jêr kontirola wan de ne, bikin), pabedniyeke din bi xwe re tîne, ango dema behanene guncaw ji bo baweriyê derbarê hebûna metirsiyeke rasteqîne ya dîtina zîyaneke ku nayê qerebokirin ji bo wî kesî, hebin, mîna behaneyên di herdu Madeyên 6 û 7 yên Peymanê de hatine, çi li welatê ku ew kes dê j bo wî were dersînorkirin, yan li her welatekî din be ku ew kes dê di pêşerojê de, were dersînorkirin, wê demê nabe bi ti awayî, ti kesî, radest an dersînor bike yan wî ji xaka xwe derxîne» [61].

Di dawiyê de, Divê Turkiyê bi Rêkeftina Rûbirûbûna Işkenceyê, bi taybet bi madeya sêyem, pabend be[62]. di nirxandina xwe ji bo keysên takekesî de, gelo Vegerandina kesekî ji bo welatekî destnîşankirî, ewle ye yan na, Komîteya Rûbirûbûna Işkenceyê rewşên giştî yên welatên peywendîdar dinirxîne, gelo awayekî sîstematîk yê binpêkirinên berçav yên mafên mirovan, heye yan na, herwiha statuya kesane ya penaxwazî, dinav de jî ola wî û girêdana wî ya isnî û ya siyasî, û dîroka wî ya girtin û işkenceyê, dinirxîne[63].

Raportên derdikevin, didin xuyakirin ku kesên vegeriyane Sûriyê, bi giştî dibin qurbaniyên dezgehên ewlekariyê, hevdemî hebûna şehadetan li ser rewşên tundutûjiya zayendî (destdirêjiya sêksî û şêwene din ên herasandin û tundutûjiya zayendî) û girtina hovane (li ser bingeha tometên girêdayî terorê, yan tometên nerast, û qurbaniyên rêkarên şopandina hovane yan şantajkirinê)[64], û Leşkeriya Neçarî. Bi giştî, weke encam ji van astengiyan re, karê pêşîn yê kesên bi Neçarî vegeriyane, dîtina rêyekê ji bo dubarekoçberiyê ye[65].

---

59 Li vir, babet girêdayî ye statuya yasayî ya ji encama Rewşa Awarte ya ku Turkiyê piştî hewla kodetaya sala 2016an ragihandî, derketî holê. Wê demê, Turkiyê niyaza xwe ji bo rawestandina bicîkirina hin pêdiviyên Peymana Ewropî ya Mafên Mirovan, ragihand, herwiha niyaza xwe ji bo rawestandina bicîkirina hin pêdiviyên Peymana Mafên Sivîl û yên Siyasî ya Navdewletî gihand Emîndarê Giştî yê Neteweyên Yekgirtî. Bandora hemî rêkarên wê Rewşê li ser statuya Sûriyan hebû, çi bi rêya yasayên ku hatine derxistin yan praktîkên ku di heyama bicîkirina Rewşa Awarte de hatine encamdan.

60 Kommenta Giştî ya jimare 20, beşê 9

61 Kommenta Giştî ya jimare 31, beşê 12

62 Madeya sêyan ya vê madeyê, dibêje:"Nabe ti welatekî Peymandar ti kesî der bike yan vegerîne "Wî red bike" yan wî radestî welatekî din bike, dema sedemine rasteqîne li cem wî welatî, derbarê egera hebûna metirsiya işkenceyê, peyda bibin.

Ji bo destnîşankirina egera peydabûn/nepeydabûna van sedeman, Desthilatên Peywendîdar hemî berçavbirinên peywendîdar, berçav dibin, herwiha dema peydabûna van sedeman li wî welatê peywendîdar, peydabûna rêbazeke domdar a binpêkirinên mezin an ên berçav an ên bi kom ên Mafên Mirovan, berçav dibin".

63 D Weissbrodt û I Hortreiter, 'Prensîpa ne-Vegera bi Neçarî: Madeya 3yan ya Rêkeftina li dijî Işkence û li dijî kiriyarine din mîna Reftara Dijwar an Reftara ne Mirovî yan Reftara Sivkatiyê yan Sizadanê bi berawirdî li gel hukmên ne-Vegera bi Neçarî ya Rêkeftinên din ên Mafên Mirovan ên Navdewletî' (1999) 5 Lêvegera Buffalo ya Yasaya Mafên Mirovan 1

64 Di Raporta Rêxistina Lêborînê ya Navdewletî ya bi Navnîşana "Berê te li mirinê ye" Binpêkirinên li dijî Penaberên Sûrî yên ku vedigerin Sûriyê" de hatiye, Çapa Ingilîzî, r.22 û rûpelên piştî wê.

65 Li şehadetên Sûriyên ku ji Turkiyê hatine dersînorkirin di Rapirsîna Navenda Sûrî ya Azadiya Ragihandinê. Movik 36 ku dawiya Berfanbara 2023yan hatiye encamdan, binêre.

Li gorî şehadetên ku Navenda Sûrî ya Ragihandin û Azadiya Derbirînê, belge kirine, rola Komisiyariya Bilind a Karûbarên Penaberan di navbera Tirkiye û Lubnanê de li hember penaberên Sûriyê ji hev cuda ye.

Li Turkiyê, Komisyariyê di çareserkirina pirsgirêkên penaberên Sûriyê de, tevî ku wan weke penaber û penaxwaz dipejirîne, xuya nake, ji ber ku bi temamî ev erk ji dewleta Turkiyê re hiştiye, weke mînak Penaberê Sûrî nikare xwe li komisyariyê tomar bike, ne jî dikare li wê vegere, û dubarenîştecêbûna ku li gorî yasayên navdewletî, û li gorî erkên Komisyariyê, mafê penaberan e, ji bo Rêveberiya Koçberiyê ya Turkiyê re ku dosyayan namzad dike, maye.

Li Lubnanê, rola Komisyariyê bihtir xuya dike, ji aliyê pêşkêşkirina alîkariyan di sekterine corbicor weke tenduristî û xwendin û alîkariyên darayî û xwarin û vegera bo Sûriyê, ji bo derdora 900 hezarî penaberên Sûrî yên ku li cem wê tomarkirî ne (bi rêya agahiyan û bidestxistina belgeyên ku dibin alîkar ji bo kesên dxwazin vegerin, û ji bo rêxistinên ku piştevaniyê li hundirê Sûriyê pêşkêş dikin), lêbelê tevî wê yekê, û ji ber sedema têkçûna rewşa aborî û kêmbûna piştevaniya taybet bi penaberên li Lubnanê, rola Lubnanê di vi warî de bi şêweyekî mezin kêmtir dibe, niha kêşeya herî xuya kêmbûna piştevaniya xwendinê ye, ew yek girîngtirîn fakterên handana vegerê ye.

# V- Vegera ewleh bo Sûriyê

Komisyariya Bilind a Penaberan dibîne ku rewş niha li Sûriyê ji bo vegereke ewleh ya penaberan, ne guncaw e[66]. heta ku penaber bikarin vegerin, Komisyarî dibîne ku divê ev merc werin bicîkirin[67]:"Hebûna çarçovene yasayî ku mafên kesên vedigerin, û gehitin ji bo wan û ji bo cihên Vegera wan garantî bikin;

1. Hebûna belgene berçav û cidî li ser bicîkirina pîvanên parastinê;
2. Pêşkeftina cidî û domdar di deverên vegera penaberan de;
3. Penaber daxwaza alîkariyê ji Komisyariyê bikin, û Komisyarî bikare şîretan li wan bike, û statuya Xwebexşane ya daxwaza wan ji bo vegerê, piştrast bike».

Û ji bo piştrastkirina hebûna van mercan, Komisyarî asta hebûna van Prensîpên parastinê, berçav digre[68]:

1. Kêmkirineke berbiçav û domdar a çalakiyên dijminatiyê;
2. Hukûmet û aliyên ku deverên vegera penaberan, kontirol dikin, gerentiyê bidin ku penaberên vedigerin rastî herasankirin, an nijadperestî yan girtina hovane yan gefxwarin, an şopandin ji ber sedemine girêdayî herêmên di bin kontrola aliyekî din de, yan ji ber derketina wan bi şêweyekê ne reawyî ji Sûriyê, yan ji ber ku daxwaza penaberiyê li derve kirine, yan ji ber her sedemeke girêdayî endamtiya wan ya malbatî yan isnî ya olî, nekin;
3. Divê biryara her kesekî ji bo vegerê li ser bingeha Erêkirina Agehdar be, û divê xwebexşiyeke rasteqîne be;
4. Divê Hukûmet/aliyên kontiroldar rêzê li bijardeya azad a kesên vedigerin derbarê navçeyên ku ew dixwazin vegerinê, bigrin;
5. Gerentiya silametiya laşî û ya yasayî û ya madî ya penaberan;
6. Ji bo peydakirina pêdiviyên taybet ên jin, keç û kesên xwedî pêdiviyên taybet, rêkar werin standin;
7. Divê zarokên ku ne li gel malbatên xwe ne, bê nerîna malbatên wan, û zanîna bijardeya herî baş ji bo berjewendiya wan, neyên vegerandin;
8. Rêz li prensîpa yekîtiya malbatî were girtin, dinav de jî mafê veger û manê ji bo endamên malbatê yên asêmayî ku regeznameya Sûriyê, bi wan re tuneye;
9. Divê penaber bi awayekî karîger di sazkirina planên vegerê de û di bicîkirina wan planan, herwiha di programên tevlîkirina wan dinava jiyana çalak de, bejdar bibin;

66 Komisyariya Bilind a Karûbarên Penaberan, "Berçavbirinên Parastina Navdewletî yên girêdayî kesên ji Komara Erebîy a Sûriyê direvin", Nûkirina 6an, Adara 2021ê.

67 Komisyariya Bilind a Karûbarên Penaberan, "Stratejiya Parastinê û Çareseriyên Berfireh: Sînorê Parastinê û Pîvanên Vegera Penaberan bo Sûriyê", Sibata 2018an.

68 Heman Çavkanî.

10. Derxistina yasayeke lêborînê ji bo kesên vegeriyane, dinav de jî kesên ku ji leşkeriya Neçarî reveriyane. Ev yasa, pêkînerên tawanên navdewletî û tawanên mafê giştî yên metirsîdar, li xwe nagire;

11. Divê Hukûmeta Sûriyê danê bi guhertinên ku di rewşa sivîl a kesên vegeriyane, rûdaye, bide, û karîna bidestxistina belgeyên wan ên sivîl gerentî bike;

12. Belgeyên sivîl ên ku ji hêla desthilatdarên dîfakto yan ji hêla Komisyariya Penaberan ve hatine derxistin, bipejirîne;

13. Rêkarine yasayî yên giring ji bo piştrastkirina nasname, û malbat û regeznameyê, bistîne, herwiha kesên ji bav an dayîkeke Sûrî jidayîk bûne, weke hemwelatiyên Sûrî werin berçavgirtin, û belgeyên jidayîkbûnê ji bo zarokên ku bê belgenameyên sivîl in, bêne dayîn;

14. Danpêdana Hukûmeta Sûriyê bi wekhevkirina bawernameyên ku di dema derbiderî/koçberiyê de hatine wergirtin;

15. Divê Hukûmet mîkanîzmeke karîger, û ne buha û berdest, ji bo çareserkirina kêşeyên malûmulkên xanûberî, li gorî yasayên navdewletî, saz bike;

16. Gehiştina azad ya kesên vegeriyayî bo desthilatên bicîkirina yasayê û bo dadgeh û desthilatên rêvebirî û bo her alîyekî peywendîdar;

17. Rêz li berpisyaretiya çavdêrî ya Komisyariya Penaberan were girtin, ne tenê ji bo piştrastkirina statuya Xwebexş ta vegerê, lêbelê divê gerentiya Vegera ewle û bi rûmet jî li xwe bigre;

18. Divê Hukûmeta Sûriyê û welatên mêvandariya penaberan dikin, gerentiya silametî û ewlehiya karmendên Komisyariya Penaberan, bidin;

19. Guhertin an balkişandin/an nîşankirina deverên mayinkirî yên li ser rêyên sereke yên vegera penaberan;

20. Ji bo çavdêriya rewşa pêşwaziyê û tevlîkirina penaberan dinava jiyana çalak de, divê gerentiya gehiştina tevahî û ya azad ji bo Komisyariya Penaberan, were dayîn. Herwiha karîna gihandin û peywendiyê ji bo hemû penaberan bo Komisyariya Penaberan, dinav de jî yên di zîndanan an di navendên girtinê de».

# XXI- Raspaste

## 1. Ji bo welatên mêvandariya penaberan dikin:

1. Rawestandina yekser û erşkere û karîger a hilmetên girtin û Vegerandina bi Neçarî ya penaber û penaxwazên Sûrî; bi taybet ew hilmetên ku armanca zarokan dikin, yan hilmetên ku bi sedema wan endamên yek malbatê ji hev tên dûrxistin;
2. Berdewamiya parastina penaber û penaxwazên Sûrî, dana niştecêbûna yasaî bi lêçûneke ne buha, û hesanî;
3. Rêz li pabendiyên yasayî yên navdewletî yên van herdu welatan were girtin, bi taybet nepejirandina Vegerandina bi Neçarî ya penaber û penaxwazan;
4. Belavkirina hejmar û amarên girêdayî penaberan, bi awayekî dem bi demî û zelal;
5. Peydakirina gerentiyên yasayî yên guncaw di dema girtina penaber an penaxwazan ji ber çi sedemekî jî be;
6. Rûbirûbûn û rawestandina hilmetên dijatiya biyaniyan, û gotarên kînê yên ku li dijî penaber û penaxwazên Sûrî, tên encamdan;
7. Delîveyên niştecêbûna guncaw bi vegera bo Sûriyê ve neyê girêdan (Alîkariya daraî ji bo vegerê);

## 2. Ji bo welatên Bexşer:

1. Bikaranîna bandora xwe ya li ser Turkiye û Lubnanê ji bo rawestandina hilmetên Vegerandina bi Neçarî ya penaber û penaxwazên Sûrî;
2. Bilindkirina diruşma parastina penaber û penaxwazan li van herdu welatan weke yekem tedbîra rêgirtinê li dijî tawanên windakirina bi Neçarî û işkenceyê û tundutujiya li dijî jin û keçan.
3. Çaresernekirina dosyaya penaberan ne tenê di çarçoveya hevkêşeyeke de ku rêkeftinên siyasî navbera welatên Bexşer û Hukûmetan de, berçav bigre, were kirin;

## 3. Ji bo Komisyariya Penaberan:

1. Zêdekirina pêwendiyan bi herdu hikûmetên Turkiye û Lubnanê re, ji bo misogerkirina parastina mafên penaberan, di serî de parastina li dijî Vegerandina bi Neçarî;
2. Pêşkêşkirina alîkariyên yasayî ji bo penaber û penaxwazan û hemahengiya vê yekê bi rêxistinên civaka sivîl ên Sûrî û ne-Sûrî re li van her du welatan;
3. Belavkirina hejmar û amarên girêdayî penaberan, bi awayekî dem bi demî û zelal;
4. Destpêkirina hilmetên hişyarkirinê û hilmetên ku armanca raya giştî li ser statuya penaberên Sûrî li van her du welatan dike.

## 4. Ji bo Civaka Sivîl a Sûriyê:

1. Destpêkirina hilmetên hişyarkirina penaber û penaxwazên Sûrî li van her du welatan derbarê mafên wan, û pêşkêşkirina alîkariyên yasayî yên bedrest û pêwîst ji bo wan;

2. Destpêkirina hilmeteke piştevaniyê ya navdewletî, bi hevpeymanî li gel mezintirîn rêxistinên berevaniyê diber mafên mirovan, û rêxistinên peywendîdar li van herdu welatan, ji bo bidawîkirina pêlên Vegerandina bi Neçarî û reftara xirab;

3. Parastina penaber û penaxwazan li van herdu welatan weke yekem tedbîra rêgirtinê li dijî berdewamiya tawanên windakirina bi Neçarî û işkenceyê û tundiya li dijî jinê li Sûriyê;

4. Peywendî bi herdu hikûmetên Turkiye û Lubnanê û bi çînên wan ên siyasî, û serkirdeyên raya giştî û civaka sivîl re ji bo hişyarkirinê derbarê metirsiyên ku li van her du welatan gefê li ser penaberan dikin;

5. Destpêkirina rêkarên dadwerî yên guncaw li ser asta xwecihî û navdewletî li dijî binpêkirina mafên penaberan, bi taybetî mafê parastinê li dijî Vegera bi Neçarî.

# VI- Dawî

Li seranserî cîhanê, mezintirîn kombûna penaberên Sûrî, Li Turkiye û Lubnanê ye, derdora pênc milyon Sûrî li van herdu welatan dimînin. Ev penaber li jêr lawaziyeke yasayî û praktîkî mezin de, dijîn.

JI aliyekî ve, ev herdu welat dana statuya «penaber» bo hemwelatiyên Sûriyê red dikin, û rola Komisyariya penaberên li hemberî penaberan, asteng dikin. Ta radeyekê, Kêmasî di çarçoveyên yasayî yên ku wan herdu welatan ji bo kirîza penaberan darişţine, de, hene, Herdu welat yasayekî berhev dikin ku mafên bingehîn ên penaberan, pişţguh dike, herwiha pabendiyên yasayî yên van hedu welatan, û sîstemên wan ên yasayî yên navxweî, binpê dikin.

Û ji aliyekî din ve, Sûrî rastî hilmetine kînê û praktîkine nijadperestiyê tên, ku netenê weke diyardene civakî ne, lêbelê gehişţine asta dîtina reftara xirab li saziyên fermî. Di rastiyê de, li gorî daxuyaniyên berpirsên van herdu welatan, armanca van praktîkan, xistina fişareke giran li ser Sûriyên ku ji bilî Vegera bo Sûriyê tevî metirsiyên li pêş wan li wî welatî, ti bijardeyeke din li pêş wan, nahêle.

Ji çend salan ta weke îro, desthilatên Turkiye û yên Lubnanê, siyaseta derkirina bi Neçarî li dijî penaberên Sûriyê bicî tînin, bi şêweyekî bi kom hevdemî kiryarine rêbazkirî yên işkence û reftara xirab, pêk tînin. Bi taybetî, desthilatên Lubnanî bi niyaz, wan penaberan rasterast radestî desthilatên Sûriyê dikin, dibe ku kesên ku ji Turkiyê jî tên vegerandin, rastî gefa praktîkên hovane, û carinan jî yên tolhildanê, dinav de jî windakirina bi Neçarî, li ser destê aliyên corbicor yên çekdarî, werin.

Raport û rapirsiyên Navenda Sûriyê ya Azadiya Derbirînê, û Rêxistina Hiyûmen Rayits Wotş, û Rêxistina Lêborînê ya Navdewletî, tekez kirine ku kesên bi Neçarî hatine derkirin, rastî işkence û istixlal û tundiya zayendî û Leşkeriya Neçarî û zîndankirina hovane, hatine. Tê xuyakirin ku derkirina bi Neçarî ya penaberên Sûrî ji Turkiye û Lubnanê, berev zêdebûneke berdewam ve ye, bi taybetî hevdemî balkişandina li ser kirîzine din li hundir an derveyê navçeyê, û kêmbûna guhdana navdewletî bi kirîza Sûriyê.

Praktîkên Turkî û yên Lubnanî, binpêkirineke eşkere ji Prensîpa Nevegrandina penaberan bi Neçarî ye, ku li gorî raportê ev Prensîp ji bo herdu welatan pabendker e. Herwiha heman praktîk li gorî Peymana Navdewletî ya Mafên Sivîl û yên Siyasî, û Rêkeftina Rûbirûbûna Işkenceyê, û Rêkeftina Jinavbirina hemû Şêweyên Cudakariya li dijî Jinê, û Rêkeftina Mafên Mirovan, û Rêkeftina Ewropî ya Mafên Mirovan ku Turkiyê li ser imze kiriye, binpêkirina pabendiyên herdu welatan e.


Metirsiya çareserkirina dosyaya penaberên Sûrî bi awayekî ku berjewendiyên demkî yên welatên mêvandar, werin berçavbirin, pêwîstî bi livandineke bi lez û cidî ji aliyê rêxistinên Civaka Sivîl yên Sûrî û yên Navdewletî, û rêxistinên hukûmî yên herêmî û yên navdewletî ye ji bo rawestandina pêlên koçberkirina bi kom ku penaberên Sûrî li pêş metirsîne corbicor datîne, herwiha ji bo gerentiya girêdana Vegera Xwebeş tenê bi pîvan û rênimayên Komisyariya Bilind a Penaberan, ve.

# Zêdetir bixwîn















Cover Image: Pixabay
أوضاع السجناء والموقوفين السوريين
في السجون ومراكز الاحتجاز اللبنانية
أكتوبر 2021


سوريا، الثقب الأسود
للعمل الإعـــلامـــي
10 سنوات من الانتهاكات
PRESS
آيار 2021
" لم تمر ثلاثة أيام دون انتهاك بحق الاعلام والاعلاميين/ت "


Cover Image: VDC
رحلة الموت نحو أوروبا والتحديات التي تواجه
اللاجئين السوريين في المخيّمات اليونانيّة
أكتوبر 2021



Cover Image: VDC
صامدات تحت خيم النزوح
نساء وفتيات في مواجهة أنماط مستمرة ومتداخلة من العنف
في شمال غرب سوريا
شباط 2022



“ Girtiyan ji bîr nekin ”
Bûyerên heri berbiçav ên têkildari girtiyan di nivê duyemin ê sala 2020’an de
2021




أبرز التطورات في ملف اللاجئين السوريين في أوروبا
2021

Bikaranîna
“çekên qedexekirî”
bi awayekî dijwarî li Sûrî
Raporek taybet di derbarê belgekirina bikaranîna çekên qedexekirî ji hêla aliyên şer yên Sûrî ve, di salên 2019/2020 de
2021
Cover Image: VDC